

Ziman U Zar

salî sêyem_ jmare (10) (sermawerz_2723) (payîzî_2023)

Govarekî zimannasî ya werzî ye

Xudan îmtiyaz:

Dr. Teha Resûl

Sernivîser:

Fereydûn Saman

Sernivîserê fexrî:

tofîq wehbî beg

Desteya şîretgerî:

d.wirya omer emîn

d,hogir mehmûd

d.mizgim çali

d.bêstûn hesen ehmed

kameran rehimî

Rawêjkara kargêrî:

Evîn ehmed

Rawêjkarî Yasayî:

Salim Selman Kûbeçî

Ziman **U** Zar

salî sêyem_ jmare (9) (gelaŕêzan_2723) (payîzî_2023)

Govarekî zimannasî ya werzî ye

Serrastker: kûkman m.şilanî - mesod lawe

dîzayn: umêd mihemed

çap: 2023

tîraj: 500 dane

nirx: 5000 dînar

çap: çapxaney taran



komelgey perwerdeyî margrêt

derî dekat

ji bo peywendî bi kovara ziman u zarî:

fereydunsaman61@gmail.com

00964 750 448 0493

Dengên Zimanê Kurdî(Kurmancî) di Proseyên Dengsazîyê de

■ Berzo Mehmûd

Zana û ronakbîr û bîrmendên cîhanê bi tewawî û bi giştî giringî dane rola ziman di dîroka mirovayetî de, wekçawa Vindrîs weha wesf dike ku dahênan û afirandina ziman bû sedema ji hev cudakirina du qunaxan di dîrokê de ku hem dawî bi dîroka heywanî û hem jî bû despêka dîroka mirovayetî¹. Ev wê yekê diyar dike ku ziman e yê ku mirov ji heywan cuda dike. Inca ziman yek ji wan dahênanên herî giring e di dîrokê de, lewra milletên dinyayê pûtendan û guhdan li zimanê xwe kirine, ku eva han jî di warê nivîsîna pertûk û ferheng û rêziman û lêkolînan de diyar e.

Dengsazî wek zanişt di sê aliyên de dabeş dibe: 1. aliyê berhemhêna deng (phonation), 2. aliyê ku deng têde tê guhaştin, 3. Aliyê ku deng têde tê wergirtin (Vindrîs rûp 43)². Inca, em dikarin bêjin ku bikarhêna ziman sê faktor têde peyda dibin: (axêver û gote û bihîser) bi awakî dîtir (nivîser û name û xwêner).

Vindrîs pûte daye aliyê guhaştina deng û lereyên ku di deng de peyda dibin wek takerekî saykolojî li nik bihîser didê³. Zar û lêv di druştkirina zingêniya deng de roleke xweyî karîger heye bo nimûne awayên bilêvkirina dengên ziman li nik xelkên Cizîra Botan û Koçerên devera Silopî ku, bo nimûne, rîşteya (were, em biçin molê) ku dengkirina peyva (malê) bûye (molê), ango dengê [a] bi awakî weha derdikevê wek tu du rengan, em bêjin, sor û şîn, li nav hev bixin, ew jî wilo piçek ji dengê [o] bi ser [a]de dikin, ku deng ne [a]ya zelal e, û ne [o]ya zelal e, heme tevlîhev e, lê heman dengê [a] li nik axêverên devera Hezex ta bigihê Nisêbînê zelal derdikevê, ango ciyawazî nav wan de diyar e, û hincar axaftina Cizîrayan li nik xelkên dîtir dibe cihê qerf û galteyan.

1 C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadîna Abdulhemîd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 1)

2 C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadîna Abdulhemîd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 43)

3 C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadîna Abdulhemîd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 43)

Herwekî Vindrîs li ser vê mijarê axiviye di awayên derkirina dengan de ku şêweya giroverkirina lêvê roleke giring têde dibînê, her ev jî di şanogeriya Xanedanê Bircuwazî (Bourgeois Gentil homme) de ya şanonivîsê Firansî, Moliyêr, diyar dibe ka aktor çilo lêvên xwe bi awakî weha çê bikê ku deng şêweyeke taybet bistênê⁴. Dengên gerûyî wek [k] tête guhartin ligor ku piştî ziman bighê paş-asmanî yan pêş-asmanî wek dengê [k] ya paş-asmanî ya Almanî di peyva (kub) de⁵ û heman deng di Kurmancî de di peyva (ko) de.

Wek ku gelek zimanzanan berî niha jî dane xuyakirin ku danûstandin û hevgihaştin navbera mirovan de bi riya ziman pêktê, û di vê pêwendiyê de sê alî rola xwe têde dibînin ta ku ev pêwendî pêk were, ew jî ev in: 1. axêver, 2. kenala gihaştinê: ziman, 3. bihîzer (bîser)

Erkên deng

Mebest jî şîrovekirina dengsazî her ew e ku takilên (element)⁶ dengî di gote û rîste û bêjeyên ziman de hişkere bike, û van takilan li gor erkên wan dabeş bike. Eger me du goteyên Kurdî gotin: (1. *Kuro*, *here*. 2. *Kuro*, *were*. 3. *Kuro*, *mere*. 4. *Kuro*, *dere*) wa diyar dibe ku yek deng di yek tevinê de û di yek cihê de tê guhartin (**h**, **w**, **m**, **d**) û ew jî dibe sedema guhartina wata û erk û mebesta axêver, wek çawa dengê /h/ di Englîzî de bi heman rol radibe ku jêre rola cudakerî (distinctive function) وظيفة تمييزية dibêjin,

4 C. Vindrîs, Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra 1950 (rup 46)

5 C. Vindrîs, Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra 1950 (rup 48)

6 Weha hate bîra min ku peyva (takil) beramberî peyva (element) a Englîzî baş dît. Peyva (takil) li nik Mesûd Mihemed diyar dibe wek tişteki biçûk ji nav gelek tiştan, bê ku watayeke taybet jêre diyar dike.

Di ziman de wa heye ku hin diyardeyên dengsazî hene ku pêwendî bi devok û zaravên hemecor re heye, û bi hîç awayî nabe sedema guhartina têgehiştinê yan wataya peyvê wek: hin Kurd dibêjin (mar) û hinên dîtir heman peyv dibêjin: me»er).

Weha jî (tal /te»el), (jeher / je»er), (jar / hejar).

Zimanvan wa dibînin ku lêkolîn di dengên ziman de pêwîstîyeke zimanewanî ye. Bo nimûne, peyva (nîne) di devoka serhedî de dibe wek (ninne) t; gotin ku dengê [î]ya dirêj hinekî kurt dibe, û hewa pirtir ji bêvilê dertê herçende ku tekez (ştrês) di vê peyvê de li ser birrgeya pêşî tê. Mebesta ew e ku her dengê di ziman de kirasekî taybet li xwe dike ku ji zimanên dîtir ciyawaz e.

Endamên axaftinê roleke giring di drustkirin û sazkirina dengên ziman de dibînin. Di dengsazî de, sazgeha dengdaran (the point of articulation) ew cih e, ku hingaftina endamên laş ji sîstîma dengkirinê bi awakî tîn ser hev, û deng têde saz dibe, ku ev jî navbera endamekî bizoz (active) wek zarê mirovan û endamekî rawestiyay û pasîv wek hin deverên asmankê dev. Dengên dengdar bi alîkariya organên nerim wek zar û organên hişk wek esmankê dev, ligel awayên dengkirinê dengdar bi taybetiya xwe dertê.

Di polênkirina dengên ziman de çend pîverên dengsazî hene ku her yek bi xalekê ji ya dîtir ciyawaz e, çî bi hoya **sazgeha dengkirinê**, û çî bi hoya **awayê dengkirinê**, û çî jî bi **peştin û hêza tewjima hewayê**, ev hersê bar dibin hokarê hemecoriya van dangan, bo nimûne du core dengên ziman hene, ji wan re dibêjin: dengdêr û dengdar.

Dengên ziman, wek hatiye zanîn, şêweyeke taybetî ye ji wê hewayê ku ji sîpelka mirovan derdikeve û di boriya hewayê re derbas dibe, lê ev hewayê han bi awakî fîzîkî derdikeve û li encamê şêwedengek drust

dibe, û durvekî xwey taybetî distênê. Ev deng dema ji qirikê tê der bi rê de pêrgî hin keleman dibe, ku ew jî: yan du deste masûlkeyên ku jêre (dengejê - têlên dengî) dibêjin, yan jî hewa dema ku di qirikê de derbas dibe pêrgî zimanbiçûk dibe, yan jî rexek ji zar (dawî, navîk, serî) digihê esmankê dev (pêş-esmank, nav-esmank, paş-esmank), yan zar ligel pidûwan, yan zar ligel diran, yan lêv ligel diran, yan jî tiştêk ji van endaman nagihin hev, ango hewa bi hesanî ji pişikê derdikeve û derbasî dev dibe, lê berî ku ji dev derkevê, herdû lêv şeweyeke taybetî druşt dikan, ku ji hev vedibin, belê vekirina van lêvan, heye lêva jor û jêr nêzîkî hev bin, wek nîvvekirin bê, û heye dûrî hev bin. Ev şewe vekirin dengêkî xweyî taybetî druşt dike, wek em bêjin druştkirina dengê [î] vekirina herdû lêvan ne wek ya barê dengê [a] ye. Weha jî dengên dîtir yên dengdêr, wek: û, u, e, i. ê, o. Înca, druştkirin û dabeşkirina dengên ziman bi awakî giştî li ser çend faktorên corawcor radiweste ku ew jî ev in:

A) Li pêka sazgeha ku deng jê derdikeve: ji nav lêvan, yan ji bêvilê, yan ji nav diran û lêvan, yan ji gewriyê, ji zengelorê, ji dev bi gihaştina dawîya zar li gel zimanok, ji zar û esmankê nerim (paş-esmank), yan esmankê hişk (pêş-esmank), ji zar û diranan derdikeve ta ku pê tê axaftin.

B) Li pêka fîzîk û awayê derketina hewayê, ango awayê derbirrîna van dangan, ka çilo ji sazgeha xwe derdikeve: çiqas fere ye, çiqas teng e, çiqas vekirî ye. Ya dîtir jî gelo tewjima hewa ji dereke hişk dertê, yan ji dereke nerim derdikeve? Gelo hatina hewa çiqasî xurt û bihêz e, û çiqasî bilez û sivik tê, yan giran tê?

C) Ev kartêkirinên han hemî jî şeweya deng destnîşan dikan, bo nimûne dengên ku ji teqîna bumbê derdikeve ne wek dengê ku ji teqîna şûşekê yan fincanekê dertê, dengê ku ji birrîna caw tê, ne wek dengê ku ji birrîna dareke hişk bê, yan dareke tîrr bê, ka ev hewa ji

sîpelkan dertê û di dev re, yan di bêvilê re, derbas dibe ku tengbûn û girtina riya hewayê bi awakî weşaw yan teqandî/teqîw yan xîşokî yan zirîngok, yan bêvilok druşt dibe ..htd. Ev hemî jî dibine fekterên sazkirina deng û dabeşkirina wan ku ji hev cuda dibin, her wilo jî wek fonêm têne jimartin ku her fonêmek tîpeke taybet dide, wek dengê [b], [p], [s], [v] ... htd.

Piroseyên Awartebûna Hin Dengdarên Kurdî

Dervî taybetiyên sîstîmrew, hin taybetiyên awarte di sîstîma dengsaziya ziman de kar dikin, ku hin deng şêweyeke bîjok digire, ku ev jî encama hin piroseyên fîzyolojî û kodengsazî (sociophonetics)⁷, druşt dibe, wek:

Hawdengkirin

Tengbûna sazgeha deng: A) Paş-esmankîbûn, B) Pêş-esmankîbûn

Bapekî û babirrkî, Berbêvildan

Emê bi kurtî van piroseyên dengsaziyê bidin naskirin, bo ku em bikevin mijara xwe ya ku pabendî diyardeya stûrbûna dengên di zaravê Kurmancî de:

1. Hawdengkirin (coarticulation) ango, ango dengkirineke hevalê ya normal e, û di ferhenga zimanvanî de weha dide naskirin: “the occurrences of sounds that correspond to speech sounds are not discrete units”⁸. Ev bi xwe di baweriya min de şêweguhartineke awarte ye ku di piroseya axaftina hin deng de di hin ziman de peyda dibe”

7 Ez naçar bûm ku du têrimên Kurdî beramberî herdu têrimên Englîzî danim ku bapekî beramberî (aspiration) tê, û babirrkî bermaberî (non-aspiration) tê, ku ev herdu têrim ligor pirose û mîkanîzîma dengkirina dengên hatine druştirin. Wilo jî hin têrimên dîtir wek paş-esmankîbûn beramberî (Velarization), û pêş-esmankîbûn beramberî (palatalization), herweha hawdengkirin beramberî (coarticulation), tengbûna sazgeha deng beramberî (glottalization), û kodengsazî beramberî (sociophonetics) tê.

8 Ferhenga Roultdge

2. Piroseya **tengbûna sazgeha dengan** (glottalization) weha ye ku tengbûneke taybet, çî hindik û çî gelek, bi awakî ku hin guhartin dikeve deng de (irregular total or partial glottal closures, ku dengên **stûr** wek [p], [t], [k] druşt dibe. Di hin ziman de dengdarin dikevin barê ku jêre (tengbûyî, glottalized) dibêjin, ango sazgeha pêş-esmank yan paş-esmank teng dibe. Li encamê, du bar têne holê: Berek heye ku jêre (**pêş-esmankîbûn**) dibêjin ango ku pêşîka zar bilind dibe bi aliyê pêş-esmank ve. Barê dîtir **paş-esmankîbûn** e, ango (velarization) ku paşîka zar bilind dibe bi awakî nêzîkî li paş-esmank dike. Bi vî awayê dengsazî, deng piçîskî tê guhartin û wek stûrbûnekê têde çê dibe.

3. Xiştexaneya dabeşkirina dengên konsonatên Kurmancî

Li ber roniya şîrovekirina dengsazî ya bûrî, min jî 37 dengdarên Kurmancî di vê cedwela xwarê de dabeş kirin ku ew jî ev e:

sazgeha dengkirinê		lêvkî	lêvd	Diran	Pidûkî	pêş	paş	zima-nokeyî	gewrî	Jêyî
<i>Kospek Plosive</i>	girr voiced	b		d ḏ			g			
	kip un-voiced	p p̰		t ṭ			k k̰	Q		
şkeştî <i>af-fricative</i>	girr				c					
	kip				ç č					
xişok <i>fricative</i>	girr		v		z ž	j	ĝ		ɥ	
	kip		f		s ś	ş	x		ħ	ə h
bêvilok (nasal stops)	girr	m		n ŋ						
rexkî/layî / انزلاقي	girr				L	l̰				
hejok givok (<i>vibrant</i>)	girr				r ř					
rewan (glide)	girr	W				y				

Çavkanî û Perawêz

¹ C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 1)

² C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 43)

³ C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 43)

⁴ C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rup 46)

⁵ C. Vindrîs , Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rup 48)

⁶ Weha hate bîra min ku peyva (takil) beramberî peyva (element) a Englîzî baş dît. Peyva (takil) li nik Mesûd Mihemed diyar dibe wek tişteki biçûk ji nav gelek tiştan, bê ku watayeke taybet jêre diyar dike.

⁷ Ez naçar bûm ku du têrimên Kurdî beramberî herdû têrimên Englîzî danim ku bapekî beramberî (aspiration) tê, û babirrkî bermaberî (non-aspiration) tê, ku ev herdû têrim ligor pirose û mîkanîzîma dengkirina dengên hatine drûstkirin. Wîlo jî hin têrimên dîtir wek paş-esmankîbûn beramberî (Velarization), û pêş-esmankîbûn beramberî (palatalization), herweha hawdengkirin beramberî (coarticulation), tengbûna sazgeha deng beramberî (glottalization), û kodengsazî beramberî (sociophonetic) tê.

⁸ David Crystal's Cambridge Encyclopedia of Language and Frederick J. Newmeyer's Cambridge Survey of Linguistics, published in 1987.

⁹ W. Bright's four-volume International Encyclopedia of Linguistics (Oxford University Press)

¹⁰ Hadumod Bussmann Routledge Dictionary of Language and Linguistics translated and edited by Gregory Trauth and Kerstin Kazazi, London and New York, First published in paperback 1998 © 1996 Routledge

¹¹ Mihemed Mesud 1987, zarawesazî pêwane, Bexdad

مسعود محمد، زاراوہ سازی پوانہ، ژماره‌ی سپاردنی به کتبخانه‌ی

FELSEFEYA ZIMAN.

Ziman i ve?

■ Maruf YILMAZ

Cûdahîya di navbera teorîya referansê û teorîya nûnertîyê de çi ye?
 Ma mirov dikare tiştêkî ku navê wî di zimanê we de tune be bihizre?
 Ma mirov bêyî ziman dikare bihizre?
 Çima filozof zimanî analîz dikin?

1. Ziman çi ye?

Ziman pergaleka dengên an nîşaneyên din ên ku îmkânê dide me ku em danûstandinê bihevre bikin... Mînak: zimanê axaftina kurdî û zimanê nivîskî. Ziman berhemdar e. Zimanekî fermî (formel) ê lêkolînê tê wateya hevoksaziya ziman û naveroka wî. Lêkolîneka bingeîn li ser semantîka ziman û naveroka wî lêkolîn dike. Lêkolîneka pragmatîk li ser ziman e û em çawa di rewşên cûda de zimanê xwe bikar anîn. Dema ku em nîqaşê li ser zimanî bikin, encama nîqaşa me dikare were şirovekirin û pirsgerêkên zimanê me dikarin derbikevin holê; ev hemû têgehên bingeîn ên felsefeya zimanî ne.

Fîlozof, prof. Ludwig Wittgenstein (2014): "Sînorên cîhana min, sînorên zimanê min e. Cîhan her tişt e. Cîhan tevahîya raştîyan e ne ya tiştan e. Cîhan bi raştîya xwe û bi raştîya ku ew hemû raştîyan pêk tê diyarkirin an îspatkirin. Ji ber ku cîhan tevahîya raştîyan dîyar dike ka çi ye û çi ne. Raştîyên di qada mantiqî de cîhanê pêk tînin. Cîhan di raştîyan de krîstalîze bûye...

1.1 Felsefe zimanî

Em çima ziman dixwînin? Em çima di felsefeyê de ziman dixwînin? Ji ber ku tiştê ku mirov dikare bi awayên cûda pirsgerêkên zimanî derbixe holê û li çareserîya bigere. Ji bo têgihîştina pirsgerên cûrbecûr ên felsefeyî divê ziman bixwe were lêkolînkirin. Ez gotina xwe bînim ser peyva hermeneutîk an fenomenolojîyê:

1. Bingeh: ji xwe **xwe** nîşan dide, ji xwe re xwe nîşan dide.
2. Hebûna heyînê, veşartî ye.
3. Fenomenolojîya hebûnê hermeneutîk e.

Mijara Felsefeya zimanî ya hemdem giraniya xwe dide ser teorîyên cihêreng ên li ser wateya tiştan, şîrovekirin, ragihandin, rastîya gotinên ziman, têkilîya ku di navbera wate, referans, rastî û îmkana zimanê taybet de hene dide xuyankirin û hwd. Ma em dikarin bêyî ziman felsefeya kurdî fêr bibin? Na. Em mînakê têgîna jîyanê bikolin, çend wateyên wê hene?

Ziman bi çarçowayê ve girêdayî ye û ew qaîdeyên xwe hene. Dema em di çarçoveyê de bin em bi awayekî ziman têdigihîjin û bikardihênin. Ziman xwedîyê norman e. Wateya zimanekî di çarçoveya civakî de bi îşaretan, întonasyon, biwêje û tiştên mirov nikare bi awayekî vekirî bibêje vedibêje. Em di jîyana xwe de ziman dibihîzin û xwe pêş dixin û ji ber vê yekê ziman ji bo me wateyê digire. Ez vebigerim ser felsefeyê. Felsefe ew zanişt e ku şert û mercên bingehîn ê hebûnê, zanîn û exlaqê lêkolîn dike. Cewhera felsefeyê aqil, rexne, arguman û pîrskirin e. Felsefe wek zanîn, epîstemolojî lêkolîna ku zanîn çi ye, çi cureyên zanînê hene û zanîn çi ye û mirov çawa dikare zanînê bi rêya zimanî bizanibe, ye. Rexnegir bawer dikin ku em çu tiştêk nizanin, em her gav dikarin tiştê ku em dizanin bizanibin. Felsefe kurdî ya kevnar di dema împêratoriya Medî û Sasanî de de wekî sîstem hebû, lê niha wekî sîstem tune ye. Mîtratî bawerîyeka olî ye, lê Zerdeşt feylesofîyeka olî ye. Xwedawend Innan roleka olî, mîtolojîk digire ser xwe û ew di hinduîzmê de jî cihekê girîng digire. Bûdîzm jî feylesofîyeka olî ye, lê koka xwe ji Felsefe Hinduîzmê wergirtiye. Baradoz helbestvan û nivîskarê zazakî-hewremanî/goranî yê sala 330î ya BZ ye. Ew nivîskarê antîkê ye...Hin filozofên kurd ev in: Zardeşt, Manî, Mazdek (Mazdak), Baba Tahîrê Hemedanî, Hallacî-î Mansur, Sihabeddîn Surewerdî, Eyn-el Qudatê Hemedanî, Evdulsemedê

Babek, Ehmedê Xanî, Dr. Cemal Nebez, bikin, ji ber ku ew xwedîyê ramanên kûr (hizrên kûr), xwedî kapasîteyên kûr û berfireh bûn. Lê em dikarin nîqaşê di derbarê raman û hizrên van kesên din de jî bikin, mînak: Abdurrahîm Mevlewî, Mele Xalîl (Molla Xalîl), Şemseddînê Şarezoro, Feqîyê Teyran, Mela Xalîl Siirdî, Meleyê Cizirî, Dinawerî, Îsmalê Bazidî, Seîdê Kurdî, Seyfûddin Amedî, Siraceddin El-Urmewî... Sufîstên îslamê û terîqetên kurdan jî hene, lê sê terîqetên kurdan ên herî bi bandor in:

1. Terîteqa Mewlana Xalîd.
2. Terîqeta Qadîrî ya Ebdulqadîrê Geylanî.
3. Terîqeta Nakşîbendî (avakerê wê Yûsûf Hemedanî ye).

Em dîsan vebigerin ser Mazdekî. Mazdak di sala 529an de bi tawana îdamê mir hat tawanbarkirin, ew şopdarê Zardeştî yê "Dema Sasanî" bû. Ew filozof, zanişt û civakreformîst bû. Manîkeîzm oleka gnoştîk ku di sedala 200î de li Mezopotamyayê alîyê Manî ve hatîye damezrandin, bi awayekî zelal sûnkretîstîk bû, di bin bandora Zardeştî, Xirîstîyanî û Bûdîzmê de mabû. Lêkolîner îdia dikin ku Manîkeîzm oleka gerdûnî ye. Filozof Manî bi xwe di sedsala 200î de hînkirinên xwe, bixwe di pirtûkên xwe de nivîsandîye.

1. Şabûragan; 2. Xezîneya jîyanê; 3. Mizgînîya zindî; 4. Mîsterî (ayînên olî yên veşartî); 5. Pirtûka Karên Dêwê; 6. Mijara pragmatîk; 7-Navname (name). Hin ji van pirtûkan tune ne...). Doktrîna Manî li ser bingeha dualîzmê, têkoşîna di navbera du prensîbên -ronahî û tarîyê de; yanî têkoşîna di navbera ronahî û hêza Şeytan a li ser cîhanê ye. Doktrîna wî li ser sê serdeman avabûye: bihuşt (behişt, cinet), serdema niha û Padîşahîya Ronahî (Padîşahîya Xwedê).

Manîkeîzmê cîhan bi dualî didît, ew nakokî di navbera laş (beden) û gîyan, made û ruh, şeytan û Xwedê de bû. Cîhan qada şerê navbera hêzên qenc û xerab e; di navbera ronahîyê û tarîyê de ye. Made xerab e, lê gîyan

(ruh) qenc e. Hemû hebûna me ew e ku em bigihîjin armancekê. Ji ber vê yekê encam ev in: divê jîyan ji bo her kesî xwedî wateyek be. Rola perwerdekar ew e ku axaftina hundirîn teşwîq bike, ferheng û têgihîştina takekesî/takekesê (xwendevan/zarok) ji cîhana derve berfirehtir bike. Li gorî Vygotsky pêşxistina ziman tê wateya pêşxistina ramanê û bi vî awayî aqil jî. Felsefeya kurdî, her yek ji gelek êkolên ramanî yên kevneşopî yên felsefeyî li Kurdistanê, Felsefeya Zardeştî, Felsefeya Mazdek, Felsefeya Zurvanî û Felsefeya Manî cih digire. Li ser dualîzma ontolojîk, têkilîya raman, ziman û madeyê, başî û xerabî û têkilîya hizr/raman û kiryarê. Tekilîya esl û hebûnê xwedî xwedî roleka girîng e, lê felsefeya îslamê qalikê derve ya felsefeya kurdî ye.

Encam: Paşbingeha kevneşopî û koka Felsefeya Kurdî proto-hindî – Aryanî ola Mitra ye ku ew di Sanskrîtî / Rîgweda û Avesta de jî heye. Zardeştî felsefeya reforma ola Mîtra'yê ye. Mîtraîzm ola Medî û Arî bû. Zardeşt filozofekî reformîst û ew li dijî ola kevnare ya Medî.

2. Zimanê Sanskirîtî, ziman û raman

Ziman ramanê diafirîne yan raman zimanê diafirîne?

Hizir çi ye? Ziman çi ye?

Ziman û ramana me bi hev re girêdayî ne û ziman ramana me dixê tevgirê û wê diafirîne. Vygotsky çi difikirî li ser pêwendîya ziman û ramanê? Vygotsky di wê bawerîyê de ye ku bêyî ragihandina civakî ne ziman û ne jî raman pêş nakeve. Ziman yek ji wan tiştên herî tevlihev e ku mirov jê fam dike, di hawîrdoreka bisînor de jî tu jîyanek wekhev nîn e ji ber vê yekê mirov fêrî cûreyeka zimanî dibe. Hizr (raman) çi ye? Ziman çi ye? Vygotsky di derbarê raman û zimanî de dinivîse û ew ziman ji bo ramanê wekî navbeynkarîyekê dibîne. Vygotsky di wê bawerîyê de ye ku bêyî ragihandina civakî ne ziman û ne jî raman pêş nakeve. Vygotsky û Piaget

cûda dihizrin. Tiştê ku vana ji hev vediqetîne ev e ku Piaget xwedîyê perspektîfeka avaker (perspektîva konstruktîvîstîyê) e, lê Vygotsky xwedîyê perspektîfeka avaker a civakî (perspektîva socialkonstruktîvîstîyê) ye. Em mirov dikarin bi ziman bihizrin, lê bê ziman jî bihizrin. Gelek heywan dikarin bihizrin, lê nikarin bipeyvin û şarezatîya wan ya zimanî tune ye. Piaget dibêje hizirkirin ziman dide afirandin. Lê Vygotsky dibêje ziman ramanê dide diafirandin. Vygotsky dibêje, ziman ramanê diafirîne. Li gorî Piaget, raman (hizr) zimanî diafirîne. Ez gotina xwe bînim ser zimanî. Zimanên ku li Hindîstan û Îranê tên axaftin wek gelek zimanên ewropî ji heman malbatê ne. Ew bû sedema teorîya zimanekî kevna, hevpar ê hind-ewropî û koka hemû zimanên hindî-ewropî Sanskrîtî û Avesta-hindî-Aryanî ye. Zimanzan dibêjin ku di navbera latînî, yewnanî, sanskrîtî, aveştayî / kurdî de hin wekhevî hene. Em dizanin ku yek ji zimanên zimanê herî kevn Sanskrîtî ye. Di zimanê Avesta û Sanskrîtî de çend hezar peyvên hevpar hene û ji hêla rêzimanî ve jî dişibin hevûdu. Kîjan zimanê cîhanê yê herî kevn e? Sanskrîtî yan Avesta zimanekî kevna e. Li Ewropayê zimanê baskî wekî zimanê herî kevn tê dîtin. Lê lêkolîner dibêjin ku zimanê baskî yekemîn ziman e ku ji Asyayê nehatîye Ewropayê, lê gelekî lêkolînerên zimannasîyê dibêjin ku zimanê baskî ji Asyayê hatîye. Di derbarê vi zimanê de du ramanên cûda hene.

Em tam nizanin kîngê zimanê mirovan û axaftina wan pêşketîye (Gärdenfors, 2007). Bi ziman, amûr û teknîlojîyên nû yên semîotîk derdikevin holê. Nivîs bû bingehe ji bo mirovan ji civakên nêçîrvanî derbas derbasî civakên çandîyê li deverên cihê yên cîhanê bibin. Ev tê wê wateyê ku nifûsa mirovan pir zêde dibû û mirovên ku di van civakan de bûn niştecihên daîmî zêde bûn. Sîstemên civakên cûda dest pêkirin ku bi çandînî, zevî, tesîten avdanê, bûn xwedanê erd, cih û warên xwe yên daîmî (Jansson, 1997; Melin, 2007; Reade, 2000). Pergala nivîsandînê ya

yekem 5000 sal berê li Mezopotamyayê bi Sumerîyan re li gelîyên çemên bi bereket ên Ferat û Dicleyê derketîye holê... ku li wir îcadên wekî çerx (tekelên erebeyê.

2.1 Ziman çi ye, çi cureyên zimanan hene?

Ziman wekî sîstemekê ye û ew li ser takekesî (kes, îndîvîd) ye. Ziman di ser kesî/kesê re ye û li her cihê jê zêdetir rola xwe dileyîze... Elementa bingehîn a sîstema zimanî, peyv, bêje û ferheng (Yilmaz, Maruf, 2007: 6) e. Tîp perçeyên herî piçûk, atomên zimanî (Molander, B. 1988) ne.

Ziman çi ye? Bi awayekî klasîk ziman pergala ragihandinê ya mirovî ku komeka peyvan ku li gorî rêgezên rêzimanî tevdigere bikar tîne. Ziman amûra sereke ya raman, hînbûn, zanîn û ragihandinê ye. Ziman amûra sereke ya ragihandina mirovan e.

Zimanê nivîskî, zimanê axaftinê, zimanê laş, zimanê dîtbarî û zimanê îşaretan...Ziman pergaleka dengên an jî nîşaneyên din e ku îmkanan dide me ku em bi hev re têkilî daynin. Zimanê kurdî yê axaftin û nivîsandinê heye. Li gorî teorîya referansê, wateya peyvê di cîhana ku peyv li ser e an jê re tê gotin e. Wateya peyva «kûçîk» ji bo hemû kûçîkên ku li cîhanê hene, tê navkirin. Pirsgirêka teorîya referansê ev e ku em di derbarê hemû kûçîkên ku li cîhanê hene, kêr dizanin. Wek mînak: Jina herî dirêj a cîhanê yan jî zîlamê herî dirêj ê cîhanê. Teorîya ramanê wateya peyvê ye ku ji wêneya derûnî an ramana ku em bi peyva pîrsê re têkildar dikin pêk tê. Wateya «kûçîk» di hişê me de wêneyek e. Prof. Saussure yekî Swîsreyî bû ku lêkolîna xwe di derbarê nîşanek an semîolojîyê de kir û derbasî nav rûpelê dîrokê bû.

Hêza ziman di destê bikarhênerên zimanî bi xwe de ye, her kesê ku bi kurdî diaxive. Di zimanî de hêz an hêzdarî heye. Pênûs (qelem) ji şûr bi hêztir e, lê ziman jî, her du jî biwêjên hevpar in lê bi rastî mebesta

me ji van çî ye. Ziman hêz e, jîyan û amûra çandê ye, amûra serdestî û rizgarîyê ye. Wateya ku em çî dibêjin, em çawa dibêjin û ya ku em dihizrin (difikirin) nebêjin.

Ziman dîrok, adet, urf, kevneşopî û awayên ramana gelê xwe yê bêhempa hildigire. Ziman hilgirê mîrasa çandî ye û nêrîna hevpar a gelan a li ser jîyan û nirxan nîşan dide. Ziman zanyarîyên cûda li ser xweza û cîhanê vediguhêze. Zimanê ev e: xeyal, raman, zimanê wêne, zimanê hindikayî, hevoka alfabetîk, aîdîyet, zimanê axaftinê, civaknasîya ziman, zimanê nivîskî, norm, bandor, wêne, rastî, civakbûn, zimanê nivîskî, ragihandin, sîstema nîşanan, fenom, qaîdeyên ziman, ferheng, zimanê laş, zimanê hêzê, zarava, vegotin, têgihîştin, heşt, nîqaş...

2.2 Fîlozofên ziman

Arîstoteles, Parmenîdes, Platon, Sokrates, Nietzsche, Zerdeşt

Bertrand, Russell, Gottlob, Saussure, Ferdînan de,

Immanuel Kant, Ludwig, Wittgenstein, Frege, Gottlob

Ma mirov bêyî ziman dikare bihizre (bifikire)?

Çima filozof zimanê lêkolîn û analîz dikin?

Ma mirov bêyî ziman dikare bihizre?

Çima filozof zimanê lêkolîn û analîz dikin?

Yilmaz, Maruf (2007: 13) îdia dike ku Ferdînan de Saussure zimanzan e û ew wekî bavê ştrukturalîzma zimanî tê nasîn. Strukturalîzm di nav semîtîyê de du (2) hindav hene, di nav xwe de dibe du beş. Beşa yekemîn rêziman, qaîde û kodên zimanî ne. Langu beşa zimanî ya sosyal û zanyarîyê ye. Beşa duhem “parole” ye, axaftin, rûberî û firehîya zimanî ye.

Koka Felsefeya ziman ji kevneşopîya ramanên rojavayî ye. Kratylosê Platon li dijî ramana wateya zimanî ya ku ji hêla peymana civakî ve hatî destnîşankirin nîqaş dike. Beşên girîng ên Organona Arîstoteles jibo

tespîtkirin û analîzkirina wateya kategorîyên cihêreng ên rîst û beşên rîsteyê ne. Gottlob Frege, Ludwig Wittgenstein û Rertrand Russell filozofên analîtîkê ne.

Ramana Arîstoteles ev e ku raştî tiştek e ku li ser tiştên ku em dibêjin an dinivîsin re derbas dibe û ne raştî bixwe ye. Di ramana Arîstoteles de ramana sereke ya duyemîn ev e ku heqîqet ji lihevkerinê pêk tê. Arîstoteles mantikvanekî mezin bû, mîna Parmenîdes, nikaribû bifike ku çawa tiştek ji tunebûnê çêdibe. Ew dibêjê: "Netîştek ji netîştekî nikare biafire". Xwedê ne afirînerê xwe ye. Ev argumana Arîstoteles, teza edediya cîhanê ye. Li cîhanê tiştên ku navên wan ên zimanî tune ne hene?

Ma mirov dikare tiştekî ku navê wî di zimanê we de tune be bihizre?

Ma hûn bi Wittgenstein re dipejirînin ku pîrsgirêkên felsefeyî tenê xeletîyên zimanî ne? «Xem neke, ez dizanim ku hûn ê fêhm nekin.» Heke hûn nikarbin bi axivin, divê hûn bêdeng bin.

Felsefeya ziman, şaxeka felsefeyê ye ku xweza, esl û bikaranîna zimanî dinirxîne. Di nav çarçoveya Felsefeya analîtîkê de mirov bi çar pîrsgirêkên sereke re eleqedar dibe: wate, bikaranîna ziman, zimannasîya kognîtîf, têkilîya navbera ziman û raştîyê. Her tiştê ku mirov dikare bi awayên cûda ziman îfade bike. Ji bo ku pîrsgirêkên cûda yên felsefî werin çareserkirin, divêyabû ku ziman were lêkolînkirin. Ziman navgîna ramanê ye û raman jî mijara lêkolîna filozof e. Felsefeya ziman qadeke ku çawanîya ziman û ramanê dikole. Felsefeya ziman bi mantiqê ve girêdayî ye.

Hûn dikarin bi ziman çî bibêjin? Ma ez dikarim zimanekî taybet îcad bikim?

Ez an em ziman çawan bikar bînim/bînin?

Têgihiştin tê çî wateyê?

Merleau Ponty ji nêrîna fenomenolojiyê dest pê dike. Ew angaşt dike ku felsefeya Sartre di derbarê "hebûn" û tunebûnê de nekariye pîrsgirêk

çareser bike. Dema ku Sartres di nava xwe de weke azadiya mutleq, hebûnê û di nava xwe de jî weke nezadiya mutleq weke cewherê diyarkirî cuda dike. Li gorî vê teoriyê, mirov jixwe "li cîhanê" ye, ji ber ku mirov hebûneka bedenî ye. Em bi destên xwe, bi laşên xwe, bi laş xwe bi cîhanê re rûbirû dimînin. Bi raştî xwebûn, ezûn û raman bi laş heye. Xweya bûyî hebûn (Collste, Göran, 1996; Tännkjös, Torbjörn Thales, 2000; Yilmaz, Maruf 2015) e.

3. Teorîyên sematîk

Sematîk li ser wateya peyvan e û armanc jî fêkirina wate û girîngîya peyvê ye. Sematîk li zelalî û an jî nezelalîya hin peyvan temaşe dike. Sê teorîyên sematîk ên cûda hene, ew jî ev in:

1. Teorîya referansê: Aristoteles, John Stuart Mill, Saul Kripke...

Wateya peyva «kûçik» pir bi hêsanî hemû kûçikên ku li cîhanê hene.

2. Teorîya ramanê (hizir): John Locke, David Hume, Eleanor, Rosch...

3. Teorîya wateyê: Ludwig Wittgenstein, Gottlob Frege, Bertran Russell...

3.1 Mantiq çi ye?

Teorîya maneyê, şaxek felsefeya zimanî ye ku mijara wê wateya bêjeyên zimanî ye. Wateya têgehekê carna bi tiştên ku têgîn nîşan dide an jî jê re vedibêje. Wateya peyvê ji raman, wêne an têgîna derûnî ya ku em bi peyva pirsê re têkildar dikin pêk tê. Wateya «kûçik» wêneyek di mêjîyê de ye.

Teorîya bikaranîna: Wittgenstein, Austin... wateya peyvê bikaranîna wê di rewşên cûda yên nivîskî de ye. Wate ne tiştê e lê di bikaranna peyvan de pêk tê. Bikaranîna peyvan ji hêla peymanên navbejeyî ve têne rêve kirin: Em liştikên zimanî dikin. Li gorî Platon, tişt ku em baş heştên xwe raşt dibînin, bi raştî ne ya raştîn e. Mirov dikare qaîdeyên derbasdar ji bo encamên raşt derbixîne. Mehdî Zana li vir e:

1. A B ye.
2. B C ye.
3. A C ye.
1. Ehmedê Xanî mirov e.
2. Mirov ê mirinê ye.
3. Ehmedî ê mirinê ye.

A: Ehmedê Xanî

B: Mirov

C: Mirin

Analîza duhemîn:

A. Hemû mirov ên mirinê ne.

B. Ehmedê Xanî ê mirinê.

C. Hemû mirov mîna Ehmedê Xanî yên mirinê ne. Hemû mirov dê bimirin.

Felsefeya ziman, şaxeke felsefeyê ye ku li ser eslê xwezayê û bikaranîna zimanî dikole.

Wittgenstein, Ludwig (1921: 25) îdia dike: "Cîhan her tişt e. Cîhan tevaya rastîyan e, ne ya tiştan. Cîhan bi rastîyan û bi rastîya ku ew hemû rastîyan pêk tînin tê dîyarkirin. Ji ber ku ew tevaya felekê ye ku dîyar dike ka çi ye û hem jî tiştê ku ne wisa ye. Cîhan di rastîyan de krîstalîze bûye. Sînorên zimanê min tê wateya sînorên cîhanya min. Mantiq cîhanê pêk tîne: Sînorên cîhanê jî sînorên mantiqê ne. Cîhan û jîyan yek e. Ez cîhana xwe me (Mikrokosmos)..."

3.2 Tez

Tezek dikare bibe:

1. Gotina yekem di argumanekê de yanî îdiaya ku hevoka destpêkê ya argumanê hatîye îfadekirin.

2. Gotina ku nivîskar herî zêde cîh jê reveqetandîye.
3. Di nîqaşê de îdîaya herî balkêş e.

3.3 Daxuyanîya tiştek

Daxuyanî tiştek e ku dikare were kontrolkirin. Mînak: Ez di demjimêr 5an de şîvê amade dikim. Ez niha diçim ba doktorî. Ez bawer im ku ez dê îro şîvê (xwarinê) amade bikim.

3.4 Daxuyanîya nîrxê

Daxuyanîya nîrxê, tiştek ku kê-m-zêde maqûl e, mirov hêvî dike ku di daxuyanya nîrxê de tu rastîyê tune ye. Xwarina dibistanê ne xweş e. Îro hewa xweş e û zarok li derve dileyîzin.

3.5 Hevokên analîtîk

Hevoka analîtîkê, hevoka ku jixwe ji ber wateya peyvên ku di hevokê de cih digirin rast yan xelet in, bêtî ku tiştên din çawan bin. Hevokên analîtîk bi ziman, tenê bi zanîna peyvên ku hevokê pêk tînin. Hemû xortên ciwan nezewicî ne.

3.6 Bendên sentezê

Bendên sentezê ên ku rastî bi raşteqînîyê ve girêdayî ye, em heştên xwe bikar tînin da ku fêr bibin ka ew dîtînan rast e yan na. Mijar ne aîdê cîhanê ye, lê ji cîhanê re sînor e. Li ku derê cîhanê mirov dikare mijareka metafîzîkî bi nav bike? Tu dibêjî qey li vir jî bi çav û qada dîtînan re jî wisa ye. Lê bi rastî hûn nikarin rastîya çawan bibînin. Di qada dîtînan de tiştek tune ye ku destûrê bide we ku hûn bigihîjin encamê ku ew bi çawan tê dîtînan. Her tiştê ku em dibînin jî dikare cûda be. Ji ber vê yekê bi rastî têgehê heye ku têde felsefe dikare bi rengekî ne-psîkolojîk behsa xwe

bike. Ez bi raştîya ku cîhan cîhana min e, dikevim nav felsefeyê. Mijarên felsefeya zimanî ya hemdem giranîya xwe dide ser teorîyên cihêreng ên li ser wateya tiştan, şîrovekirin, ragihandin, raştîya gotinên zimanî, têkilîya ku di navbera wate, referans, raştî û îmkana zimanê taybet de hene dide xuyankirin û hwd. Zanîn, epîstemolojî lêkolîna ku zanîn çi ye, çi cureyên zanînê hene û zanîn çi ye û mirov dikare çi bizane ye. Rexnegir bawer dikin ku em çu tiştêk nizanin, em hergav dikarin tiştê ku em dizanin zanibin.

3.7 Teorîya referansê çi îdîa dike?

Mirov çawa dikare li dijî teorîya referansê nîqaş bike?

Ya ku wateya semantîkê, peyvek, hevokek, gotarekê îfade dike çi ye?

Di nava ziman û felsefeya zimanî de mirov bi gelemperî behsa çar warên sereke dike:

1. Wate:
2. Bikaranîna zimanî
3. Konstruksiyona zimanî
4. Têkilîya ziman û raştîyê

Semantîk li ser wateya peyvan e û armanc jî fêrkirina wate yan girîngîya peyvê û hem jî wateyên alternatîf pêwîst in. Ev semantîk li zelalî û an jî nezelalîya hin peyvan temaşe dike.

Pêşniyarên nîrxê yê ku diyar dikin ka tiştêk çawa tê fêmkirin.

1. Nêrînên heştyar ên wekî kê-m-zêde maqûl.
2. Nêrînên ehlaqî yan estetîkî yê kê-m û zêde maqûl in.

Mînak: Amed bajarekî xweş e. Parîs paytexta Fransayê ye. Hewlê paytexta Kurdistanê ye.

Gelek peyv behsa tiştêkî nakin, mînak û, an, lê... Ya ku behsa wan dikin cûda ye. Wateya peyvê dema temsîla peyvê ye. Li vir semîotîk sêalî ye:

1. Têgînê îfade bike.

2. Wate, wateya peyvê.
3. Referans, objekt, dîyarde.

Peyvên «semotîk», «semîolojî» û «strukturalîzm» her sê jî bi heman awayî girîng in. Herdu peyvên ên pêşî yên herî hêsan in. Her du jî bi Yewnanî wateya nîşaneyê ne. «Semîolojî» û «semiotik» bi raştî hevwater ne û wateya zaniştîya nîşanan didin.» Semîolojî» têngîna Saussure ye lê «semyotîk» îcada filozofê Amerîkî Charles Sanders Peirce ye. Ev nivîsar zêde giranîya xwe dide li ser Saussure'yî. Ew wisan dibêje: Ziman pergaleka nîşanan e ku tiştekî îfade dike û di vî warî de bi nivîsandinê re tê berawirdkirin... Li gorî Saussure, nîşan komplekse e nayê dabeş kirin... Wateya hevokê hinekî hevpar e, lê bawerî û raman bi tevahî taybet in. Pêdivî ye ku mirov biryar bide ka hevokek raşt e an çewt e.

Her peyv wek navê tiştekî tê dîtin. Dema ku em dizanin ku peyvên cûda tene çî wateyê, em wateya hevokê têdigihîjin. Felsefeya ziman bi mantiqê ve girêdayî ye.

Mirov çawa dikare li dijî teorîya nûnêrtîyê nîqaş bike?

Hûn dikarin bi zimanî çî bibêjin?

Ma em dikarim zimanek taybet îcad bikin?

Em çawa zimanê dayikê an jî ziman bikar tînin?

Tênegihîştina Zaza û Kurdan tê çî wateyê?

Arguman gotinek e ku bi guman dikare piştgirî bide gotineka din.

Ji bo raştbûna argûmanê bingeheş hene.

Têkilîyeka mantiqî di navbera argûman û tiştê ku bi wê re were îsbat kirin de heye.

3.8 Cûdahîya di navbera teorîya referansê û teorîya nûnertîyê de çî ye?

Cûdahîya di navbera teorîya referans û nûnêrtîyê de ev e ku teorîya referansê ev e ku peyv dikare tiştek vebêje, dema ku teorîya nûnêrtîyê ji we re hewce dike ku hûn bikarbin peyvê ji axafvan xeyal bikin û hizra

peyvê werbigirin. Pêdivîya veraştîkirinê tê çi wateyê ji bo wateyê? Li gorî pozîtîvîstên mantiqî, pêdivîya veraştîkirinê tê vê wateyê ku mirov bikaribe diyar bike ku ka gotina domdar rast e. Teorîya bikaranînê tê wateya ku hevok wateya xwe distîne. Em normên xwe çawan, em tiştan bi hev ve girêdidin. Em dikarin normên civakî bişkînin.

4. Teorî, bikaranîna ziman, lîngvîstîka kognîtîv, têkilîya feylesofîya ziman û rastîyê

Girîngîya zimanê me di felsefeya zimanê de (Collste, Göran, 1996; Tännhjös, Torbjörn Thales, 2000; Wittgenstein, Ludwig, 2014; Levi – Strauss, Claude, 1973; Saussure de, Ferdînan, 1970) ye. Saussure de, Ferdînan ziman (1970) kir du beş. Beşa yekem wî navê "langua" kir, ku pergala razber a rêziman, rêgez, qaîdeyên zimanê û kodên ku ji bo ragihandinê hewce ne. Di beşa yekê de ziman wekî sîstemekê ye. Beşa duyemîn "parole", biwêj bi xwe, rûbera ziman û diyardeya derve ya ziman e. Bi taybetî ji bo çalakîya kesane ya axatinê ye. Profesora Ferdînan de Saussure (1857 - 1913) zimanzan, fîlozof, damezrînerê ştrukturalîzma zimanê ye. Nêrîna Saussure ya li ser ziman ji du perspektîfên cûda pêk tê. Yek ew e ku ziman sîstemeke pergaleke semîotîkê ye. Ya duyemîn jî ziman diyardeyeke civakî ye.

Fîlozof Charles Peîrce sê nîşandeyên zimanê girîng dibîne; ew hersê çînen nîşanê îkon, îndex û sembol in. Charles Peîrce bawer dike ku bi bingeîn cûreyên nîşanan hene. Ew celeb nîşanan ev in: îndeks di karaktera xwe de nîşanek e. Îkon nîşanek e ku ew di kapasîteya wekhevîya xwe ya çavkanîya xwe de nîşanek e. Ya dawîn sembol e, nîşanek e ku tenê bi lihevîkirinê ve girêdayî ye. Frandsen, Johansen & Eleruo (1897: 75) jî prensîbên rêziman û cilûbergan didin ber hev û analîze dikin. Em çawan cil û bergên xwe hildibijêrin û li xwe dikin; ew behsa gramatîka (rêziman) cilan dikin.

Ji bo Fernand de Saussure û ştrukturalîştan wate ne ji ziman wêdetir e, di simbolîzma xwe de heye. Henri Lefvre filozof û civaknasê Marksîst ê Fransî rexnegirê bû. Zimannasîya ştrukturalîzmê, zanişta ziman e ku ziman wek pergaleke avahîyên di astên cûda de dibîne. Ferdinand de Saussure zimanzan, avahîsazê ziman e, profesorê zanîngeha Cenevreyê bi sanskrîtî ye û li ser rêzimana berawirdî ya hind-ewropî lêkolîn kirîye. Feylesofîya ziman, şaxeke feylesofîyê ye ku li ser eslê xwezayê û bikaranîna zimanî radiweste (Wittgenstein, Ludwig, 1921: 25 - 60) ...”

Ziman wekî sîstemekê ye û ew li ser kesî/kesê (takekes, îndîvîd) ye. Ziman di ser takekesî/takekesê de û li her cihî jêdetir rola xwe dileyîze. Li gorî Molander, B. (1983, 1988) elementa bingeîn a sîstema zimanî peyv, bêje û ferheng in. Tîp (heft) perçeyên herî piçûk, atomên zimanî ne (Yilmaz, Maruf 2007).

Manson, P (2003) ziman sîstemek ji sembolan e. Her semboleke maneya xwe heye. Ew giranîya xwe dide ser zimanî û li gorî wî ziman wekî ştruktorekê ye. Ji perspektîva ştrukturê re dibêjin ştrukturalîzm.

Zardeşt wiha got yan jî Zerdeşt wisa got. Ew pirtûkek ji bo her kesî û tu kesî ye. Pirtûk nivîseka filozofê alman Frieddrich Nietzsche ye ku ji çar beşan pêk tê di navbera salên 1883 -1885an de hatîye nivîsandin û çap bûye. Vegera ededî ya heman mirina Xwedê û Pêxembetîyê ye.” Nietzsche bi felsefeya xwe ya zimanî bi “supermirov” (sermirov) afirand. Li gorî Nietzsche sermirov (supermirov) çi ye? Felsefeya supermirov bi hinduîzmê û felsefeya rojhilatî re xweş lihev tê. Felsefeya Hindî, mîna hemû sêwiranên olî li Hindîştanê, berî her tiştî armanc dike ku bigihîje zanîna ku azadbûna (moksha) ji cîhanê û ji nû ve zayînê dixwaze. Buddha kurê qiral bû. Felsefeya Budîst, doktrîna Dharma an ”abhiddharma” ye. Dharma di Sanskrîtî de têgehek navendî ye. Felsefeya Budîzmê xwedî wateya hindî ya

rêkûpêk, qaîde, nîzam, zagon (qanûn), qeydeyên civakî ye. Di Budîzmê de wateya norma gerdûnî wergirtîye. Hemû beşên cîhanê ji "faktorên hebûnê" pêk tên. Bûdîzm di rastîya xwe de ne ol, lê felsefeya olê ye.

Di felsefeya zimanê kurdî de sê tîgîn hene, ew jî ev in: qayîl (stîpulatîv), ferhengografî û qanîhker (persuasîv). Felsefeya ziman, xwezayî giştî ya ziman û tîkîlîya wî ya bi cîhan û ramanê re heye ku rastîyê bi zimanî dihesibîne û dinirxîne. Bi gotineka din, felsefeya zimanî, tîkîlîya di navbera ziman, raman û rastîyê de ye.

Hevokên sûntezê:

1.. Hemû xortên Amedî (Diyarbekirî) por reş in. Ji bo ku ez bersîva rast bizanibî divê ez di derberê porên xortên Amedî de lêkolîn çêbikim.

Bes e ku ez tenê xortekî ne porreş bibînim, ku ew hizr (raman) derew e.

2.Hevokên analîtîkê

PKK partîyeka demokrat e. Mehmed Şener ji PKK'ê ve hat kuştin û ew jî bo ramanên xwe hat kuştin. Encam PKK ne partîyeka demokrat e.

Huda Par partîyeka demokrat e. Raşt e? Na. Huda Par du hevalên min yê piçûkîyê bi saxî di mala xwe de kirin bin erdê. Ez behsa felaketa senaryoyên mezin nakim, tenê mînak didim. Huda Par totalîtarîst e. Ji bo Filîstînê bi hezaran kurdên Bakur kom kir û ji bo Filîstînê xwepênîşandanên mezin li Amedê (Diyarbekir) li darxişt, lê ji bo kurdan wisan nake.

Berê Huda Par rengekî Hizbullah, Jîtem û AK partîyê bû.

AK partîyeka demokrat e. Raşt e? Bersîv: Na. Diyar e ku mirovahî nikare komkujiya Boboskîyê (Qilaban) ji bîr bike. Terora dewletê ji rêveberiya dewletê ya ku piştgirî dide komên terorîstên xwe yê ku li dijî kurdan tevdigerin. Di desthilatdariya AK partîyê de azadiya raman, azadiya çapemenî/azadiya axaftina siyasî, azadiya civînan, mafê demokrasiyê, mafên kêmnîetewan/gelên xwecihî û mafên neteweya kurd/ kurdên xwecihî

hatiye binpêkirin û hin serkirdeyên AK partîyê antî kurd in.

Hemû îzmîrî (îzmîr) tirk in. Bes e ku ez tenê mirovekî ne tirk bibînim, ku ew mirovê ne tirk di zimanê tirkî de hatiye çêkirin û bûye tirk.

Hemû xwişk xizmên mêr in. Ev hevok derew e ji ber ku xizm û xizmeke jin e.

3. Hevokên diyarker

Mînak: Ev otomobîleka baş e. Têgihiştina tiştê ku ev otomobîleka baş e, tê guhartin. Heke em peyva baş ji hevokê derbixin, hevok dibe teorîk.

4.1 Heidegger, Nietzsche

(Nietzsche, F.1885: 15 – 17 - 196) Mirov kelek e, di navbera heywan û mirovê serwer (sermirov, superman) de tê girêdan. Mirov di navbera heywan û sermirov de tim tê girêdan.

Nietzsche rewşeka hîpotetîk saz dike ku tê de «cin» derdikeve pêşberî ferdekî û hezkirina wê ya ji jîyanê diceribîne û jê re dibêje bila, tu jîyana xwe bijî» (Heidegger, M.1997: 257). Jixwe heyînek ku hebûn bi vî awayî yekî ve girêdayî ye em jê dibêjin hebûn. Careke din û bêhejmar, carên din.» Pêxember/filozof Zerdeşt hatiye cem gel da ku mirina Xwedê ragihîne, lê di heman demê de ji bo ragihandina tiştê ku divê li şûna olê bigire hatiye: sermirov/Mirovê Serwer (supermirov).

Nietzsche Ziman wekî nexweşîyekê ye. Ziman dikare bibe sedemê şerê giran an aştî ye. Xerabî ji ziman û ramanê diafire (Yilmaz, Maruf Yilmaz, 2015).

Nietzsche: ”

- Bê muzîk, jîyan dê xeletîyek be.
- Huner peywira raşt a jîyanê ye.
- Mirov heywanê herî zalim e.
- Raştî nînin, tenê şirove hene.
- Hunera me heye ku em ji raştîyê nemirin.
- Ez tiştêkî me, nivîsên min tiştêkî din e.

- Zehmet e ku mirov ramanên xwe bi bîr bîne bêyî ku sedemên wan ji bîr neke.
- Li bihuştê, hemû mirovên balkêş winda ne.
- Bi rastî, tenê yek Mesîhî hebû û ew li ser xaçê mir...”

Gelo mirin di wateya Martin Heidegger (1987) de ”hebûn” e? Tiştê ku Martin Heidegger dibêje, li ser mirinê weke rengê hebûnê yan nebûnê ye. Heke hebûnek li derveyî dem û mekan hebe ku mirov nikare bibîne? Li kuderê ne destpêk ê ne jî dawî heye. Li vir hebûna rastîn heye. Ji bo Heidegger, «bûn» cîhê malê ye. Ew bingeş û eslê tiştan e ku Martin Heidegger lê digere. Hebûn mirov e. Ji bo Heidegger ziman maleke heqîqetê ye. Ji bo René Descartes, hebûn «tiştê ramanî» ye. Di gotareke navdar a sala 1892-an de «li ser wate û wateyê», Gottlob Frege herdu navdêr û navdêrên xwerû, wate û wateya wan ji hev vediqetîne, ku ya paşîn bi navdêran ve tê destnîşan kirin. Têgihîştina ramana mantiqê ya Frege çawa ji ya Kant cûda bû?

Kant û Frege li ser naverok û mijara mantiqê li hev kirin?

Kant û Frege herduyan çankanîyên mantiqî dîtin?

Yek ji cûdahîyên herî girîng ên di navbera Kant û Frege de hene, çavkanîyên mantiqê ne. Mantiqa Kant bi teorîyeka termên Arîstotelesî ve hatîye sînorkirin û hêskirin. Arîstoteles reyalît û materîyalîst e. Her tişt jî form û madeyê pêk tê. Bêyî hev nikarin bijîn. Mêr form e û jin jî made ye. Wî felsefeya xwe kir çar beş: fîzîk, metafîzîk, mantiq û etîk.

4.2 Nêrîna empirîst a ziman

Locke di wê bawerîyê de ye ku zimanê me li pişt ronahîyê vedihewîne û ev erka feylesofîyê ye ku hemû peyv û bêjeyên nezelal ji holê rake. Hobbes di wê bawerîyê de ye ku ziman berê sîstemeke sînyalan bû û pêşketîye. Hobbes di wê bawerîyê de ye ku ziman li ser wateya îfadeyên

cihêreng ên di ziman de peymanan/lihevkirinan çêdike. Platon difikirî ku hûn dikarin wateya peyvan kifş bikin, lê Hobbes bawer dike ku em wateya peyvan didin. Li gorî Berkeley, ziman bi wêneyên konkret ên ku taybet in ve girêdayî ye.

Beauvoir, Simone de (2013) dibêje: "çanda civakî jinê dike objekt. Jin bi zimanî tê çêkirin, an tiştê ku heye, ji cihê ku lê ye, jê derbas bibe û dibe yeka din. Behsa jin û hebûna wê dike. Beauvoir di wê bawerîyê de ye ku ferd (takekes) azad tê cîhanê û girêdana zayenda bîyolojîk afirandinek e. Zayendî wekî avakirina civakî ye. Beauvoir dibêje: " cins heye û mêr mijar / subjekt e. Jin objekt û bindest e; jin zayenda duhem e.

4.3 Gotinên pêşîyan li cîhanê filozof:

- «Ziman gîyanê aqil e û çareserî pêvajoya bingeîn e ku tê de ev aqil li derveyî ezmûnên asayî yên jîyana rojane tê çandin.» Charles Scribner.

- «Ziman ne tenê wesîleya ramanê ye, ew amûreka baş û bandorker a ramanê ye» (Sir Humphrey Davy).

- Ziman ronahîya hiş e. (John Stuart Mill).

- Ziman bîr û metafor e. (Storm Jameson).

- Ziman xwîna gîyan e ku raman tê de diherike û jê mezintir dibe. (Oliver Wendell Holmes)

- Zimanê me nîşana hebûna me ye. Ziman ronîkirina tam a karakter û mezinbûna axafvanên xwe ye (Cesar Chavez).

- Ziman bi tenê hewce ye ku wateya xwe ragihîne (Konfucyûs).

- Ziman hêz, jîyan û amûrê çandê, serdestî û amûrê azadîyê ye (Carter). Ziman gîyanê aqil e, xwendin jî pêvajoya bingeîn e...

- Ziman xwîna gîyan e ku raman tê de diherike û pê mezin dibe. (Oliver Wendell Holmes).

- Zimanê me rengê me ye. Zimanek raştîya karakter û mezinbûna axafvanên xwe ye. (Cesar Chavez).

•Fêrbûna zimanekî din ne tenê tê wateya fêrbûna peyvên din ên ku heman wateyê ne, ew tê wateya fêrbûna ramaneka din jî. (Flora Lewis).

•Fêrbûna zimanekî din mîna bûyîna kesek cûda ye (Haruki Murakami).

•Heke hûn bi zimanekî ku ew jê fêm dikin biaxivin, hûn bi serê wan re diaxivin. Heke hûn bi zimanê wan biaxivin, hûn bi dilê wan re diaxivin (Nelson Mandela).

5. Felsefe û ziman

Li gorî Jacques Derrida, em raştîyê bi ziman şîrove dikin. Raştîyeke objektîf nî ne, tenê nêrîn û şîroveyên cûda hene. Ludwig Wittgentein sînorên ramana mirovî bi bikaranîna mantiqê afirîye. Ew îddîa dike ku di hemû ragihandinê de lîstikên ziman hene. Heke em bixwazin cîhanê fam bikin, divê em li ser zimanê lêkolînê bikin. Sînorên ziman, sînorên cîhanê ne. Feylesofî îradeya desthilatdarîyê ye. Feylesofî tenê têgihîştina zimanê ye. Tenê bi mantiqê em dikarin ehlaqeka baş biafirînin. Ludwig Wittgenstein (2014: 25, 26) wisan dinivîsî: "Cîhan her tişt e. Cîhan tevahîya raştîyan e ne, ya tiştan e. Cîhan bi raştîya û bi raştîyan ku ew hemû raştîyan pêk tê diyarkirin û îspapkirin. Ji ber ku Cîhan tevahîya raştîyan diyar dike ka çi ye û çi ne. Raştîyên di qada mantiqî de cîhanê pêk tînin- Cîhan di raştîya de krîstalîze bûye..."

5.1 Paradîgma, hevoksaz, peyv, wate û çêkirina wateyê

Ferdînand de Saussure (1970:155, 156) dibêje ku têlilîyên paradîgmâtîk (asosyal) û hevoksazîyê bi du awayên çalakîya me re têkildar in, ku herdu jî, ji jîyana axaftinê re neçar in. Lèvî-Strauss, Claude (1908 - 2009) zimanzan û damezrînerê ştrukturalîzma antropolojîyê ye. Ez dê di nivîsareka xwe ya din de zêdetir behsa wî bikim. Lê Saussure (1857 - 1913) wekî bavê zimannasîya nûjen ya giştî tê zanîn. Pirtûka wî ya herî bi nav û deng

"Cours in General Linguistics" e. Li gorî Saussure nîşan, (nîşan) wekî tişteki ku du karakterên xwe hebe, wêneyeka deng (le sigifiant) û têgehek (le signifié) destnîşan dike. Ne tenê peyv nîşan in, lê ji bo nimûne -C jî nîşanek (wêneya dengî ji bo naveroka genîtî / berfireh an jî pasîf) e. Li gorî Saussure, ziman pergalek nîşanan e. Her karakter bî serê xwe bi tevahî bêwate ye, bi kêfî hatîye hilbijartin. Ev pirtûk di sala 1916an de li Parisê çapbû û di sala 1959an de li New Yorkê bi wergera îngilizî hatîye çapkirin. Li gorî Saussure (1916) bêyî ziman, em nikarîbûn raştîya ku em lê dinihêrin, şirove dikin, hildigirin û tê de derbas dibin biafirînin. Awayê îfadekirina me raştîya me ava dike. Di dîroka felsefeya zimanî de cihê Ferdinand Saussure pir mezin e, lê mirina wî Claude Lévî -Strauss jî roleka mezin leyîst.

Langue ziman wekî pergalek e û bi vî rengî dikare bibe mijara analîzê. Teorîya Saussure ew e ku ziman ji nîşanê pêk tê. Her karakterek ji du beşan pêk tê. Ziman mîna koka darê, bi qasî taca darê raman an têngîna darê ye. Beşa duduyan ew e ku bi rêya wê raman an têgeh ji me re tê gihandin an gotin an jî bêjeya nivîsînê ye.

Bi heştên xwe, em cîhana derve têngihîjin û diceribînin. Hûn çawa dizanin ku ew tama qehweyê dide. Ez heşt dikim. Bi awayekî em dikarin raştîyê fêr bibin. Mînak: Heke em tama qehweyê biceribînin. Lê em dikarin tamê bi awayên cûda şaş şirove bikin. Peyv wateya xwe digirin, sembolên tişteki ne. Mînak. Mîh spî ne, ez raşt im? Semantîk lêkolîna wateyê ye. Zimannasî avahîya argumanan e, nakokî/nezelalî, mecazî, avahîyên îdeomatîk e. Lê Feylesofî ontologî, epîstemolojî û hişmendî ye. Li gorî Sapîr ziman amûreka fêrbûnê ye, lê ji bilî vê ziman jîyana civakî hildigire, bi zimanî ve civakbûn pêk tê. Ziman ji bo axaftvanan sermayeka mezin e, ne tenê wekî navgînek ragihandinê, ziman nasnameya mirov diyar dike. Axaftina bi zimanê zikmakî ji her kesî re agahî dide ku em kî

ne- Hêza ziman li ser ramanê ye. Zimanê ku em pê dipeyvîn dîyar dike ku em cîhanê çawan dihesibînin û şirove dikin. Çima feylesof li ser zimanî lêkolîn dikin? Ziman çi ye? Ma mirov bêtî ziman dikare bihizre? Ziman navîna ramanê ye û raman jî mijara lêkolîna feylesofiyê ye. Erka nivîskar ne ew e ku em hemû peyvên ku dikarin bibêjin, binêje, lê ew e ku tiştê ku em nikaribin bibêjin, bikaribe ji me re bibêje.

Maruf YILMAZ: Ez dikarim çar cureyên ramanên ku wateyên cûrbecûr înkâr dikin ji hev cûda bikim:

1. Ez hemû nîrxên objektîf û exlaqî înkâr dikim. Peyvên wekî başî, xirabî an rastî an xeletî ne tiştêk din in, raman bi vî rengî bi bingeîn bêtate ne.

2. Dema ku ez ramaneka epîstemolojîk dihizrim (difikirim), ez înkâr dikim ku di cîhanê de heqîqetên serbixwe û objektîf hebin û bi vî awayî zanîn ne gengaz (mumkin) e.

3. Ez înkâr dikim ku wateya jîyanê heye ji ber ku ez çî bikim jî ez bi mirinê diqedim. Her tiştê ku ez dikim bêtate dibe.

4. Ez înkâr dikim ku wateya jîyanê ya objektîf heye. Rastî di zimanî de konstruksiyon e.

Pirtûka Arîstoteles "Organon" i nivîsên Arîstoteles ên li ser mijarên mantiqî û semantîkî pêk tê. Li gorî Arîstoteles xweza ji bêsînoriyê direve ji ber ku netemam e û xweza her tim li dawîyê digere.

Ji bo Platon cîhana ramanan ya baş, rast û ebedî temsîl dike. Platon dihizrî (difikirî) ku îdea hebûneke serbixwe ji tiştan heye, lê Arîstoteles jî wisa difikirî ku ev nerastî e (xelet). Ramanger Platon kî bû? «Nezanî koka hemû xerabîyan e» lê bi rastî li pişt van gotinan kî bû? Divê dewlet rastîyan derxîne pêş. Rexneya mantiq û felsefeyê di nav mantiqzanên navdar de tê dîtin. Ludwig Wittgenstein di ziman de du cureyên têkilîyan ji hev cûda dike. Ew hevokên serekî û yên neserekî ne. Em wêneyên rastîyan çêdikin.

Wêne modela raştîyê ye. Tiştên ku di wêneyê de bi hêmanên wêneyê ve girêdayî ne. Di wêneyê de hêmanên wêneyê ji bo tiştan radiwestin. Ya ku wêneyê pêk tîne ev e ku hêmanên wê bi rengê taybetî bi hevûdu re têkildar in. Wêneyek fatûreyek e. Li gorî Descartes. Laş û giyan (ruh) du alîyên hemanekê ne, du awayên cuda yên tişteki ne.

6. Gotûbêjî (nîqaş)

Ji bo Prof. Saussure, paradîgma zimanî ew e ku di serî de ziman, ziman ku wekî pergala fermî ya cûdahîyan tê fêmkirin, jihev vediqete. Şirovekirina filozof Barthes ya di derbarê pirtûka Saussure ya dersên semyotîkê de balkêş e.

”Maruf YILMAZ dibêje Kurdistan di nav şer de ye û sîyasetmendar jî xayîn in”.. Ma em dixwazin zarokên me bi darê zorê li kolanan pardekîyê bikin? Ma em Kurd divê destûrê bidin wan ku vê yekê berdewam bikin? Berî her tiştî ew îfadeya nezanî û tirsê ye, nezanîna xwezaya taybetî ya kesên ehmeq e. Li Bakur xelaya însana heye. Gelek mirov hene, lê mirov tune ye (mirovekî wekî Ehmedê Xanî tune..). Ez li Bakur ji bilî koleyên sîyasî mirovan nabînim.

Ji xeynî xwîn, xwidan û hêsiyan tişteki ku ez pêşkêşî we bikim nemaye. Ji lewre ez hêrs dibim, pir hêrs dibim. Kurdên bakur xwedîyê nêrînên herî xerab, bêhna rizînê, xem, sosret, ehmeqî, pîştî, herî bi jehr û nexweş ên cîhanê ne. Ez ne peymend im, ku ji we re raştîyê bibêjim.

Ez tu carî rûyekî ji bîr nakim, heta bi heta lê dema mijar dibe gelê min ez amade me ku îstisnayekê bikim. Bawerîya min bi wekhevîya her kesî heye, ji bilî rojnamevan û wênekêşên sîyasî. Tiştê ku hûn dibêjin girîng e. Hûn çawa dibêjin ew dikare bandorê min bike. Sokrates bawer dike ku divê her tişt ji dijberan pêk were.

Zanebûna raşt bi zanîna ku tu tişteki nizanî pêk tê. «Retorîk hunera axaftinê ye ku ji bo kesên din guhdarî bikin. Li gorî min ‘axaftin’ ne hunera axaftinê ye, hunera guhdarkirina kesên din e.”

Retorîk lêkolîna îqnakirinê ye. Retorîk ji alîyê Arîstoteles ve li Yewnana kevnar hatîye afirandin. Retorîk li ser sê stûnên sereke hatîye avakirin:

1. Logoyên ku bi mantiq, aqil û aqil hatine îqnakirin, rastî, zanîn, rastîya çêkirî... Çi dibêjî? Bêje!

2. Ethos: dilxweşkirin, kirin, heyecankirin, bijartina peyvan, dengê dengîn, serpêhatîyên we, pêbawerî... Kî? Bêje ka tu çi dibêjî!

3.. Pathos: heşt, axaftina qêrînî, peyvên heştyarî. Ji kê re? Te çi got bêje!

7. KURTE

Felsefeya ziman, şaxeke felsefeyê ye ku xweza, esl û bikarîna zimanî dikole. Di nava Felsefeya analîtîkê de mirov bi çar pirsgrîrêkên serek re eleqedar dibe: Bikaranîna ziman, lingvîstîka kognîtîv, têkilîya ziman û rastîyê. Felsefeya zimanî vekolînek e, ku em çawan wateyekê didin deng û nîşanan bi awayekî ku em bikaribin ramanan ragihînin û formule bikin, ji me re dihêle ku em her tiştî li ser aştêka bingeîn zêdetir bihizrin (bifikirin). Felsefeya zimanî pirsên wekî wate, rastî, şirovekirin, çawanîya ragihandinê pêk tîne. Têgehên navendî di nav semantîk û pragmatîkê de tene lêkolînkirin. Felsefeya Kurdî dualîzma ontolojîk, têkilîya raman û madeyê, dualîzma etîk ku di navbera baş û xerabîyê, têkilîya di navbera raman û birêvebirîyê (danûstandin) de dizivire, heye. Têkilîya esl û hebûnê ji bo filozofên Kurd ên Serdema Navîn pir girîng bû. Têkilîya baş di navbera raman, danûstandin û ziman de jî girîng e.

Cîhan her tişt e. Cîhan tevahîya rastîyan e ne ya tiştan e. Rastîyên ku di qada mantiqî de cîhanê pêk tînin hene; cîhan di rastîya de krîstâlîze bûye.

Thales BZ jîyaye, yek ji «Heft filozofên Yewnanîstanê» û nûnerê yekem ê felsefeya rojavayî ye. Kevintirîn filozofên Hindî û metnên sanskrîtî yê felsefeyî bûn bingeha felsefeya Zardeşt, felsefeya Thales a Yewnanî û felsefeya Îrana kevnar Aryana. Felsefeya Hindî, mîna hemû

meylên olî li Hindîstanê berîya her tiştî armanc dike ku bigihîje zanîna ku dikare azadbûna xwe ji cîhanê ji nû ve zayînê bide. Ziman ji bo axafvanan sermayeka zêrîn e, ne tenê weki navgîneka ragihandinê, lê ji ber ku ziman nasnameya mirov dîyar dike.

8. Çavkanî û referens

1. Barthes, Roland (1976). Bildens retorik: Aspelin K. & B. Lundberg. 2. Beauvoir, Simone de (2013). Mandarinerna med förord av Anneli Jordahl.

3. Wittgenstein, Ludwig (2014). Tractatus logico-philosophicus. Wergera ji zimanê almanî: Sten Andersson. Weşan: Norstedts Stockholm. Orjînalê çapa almanî: 1921

4. Ludwig Wittgenstein (2009). Filosofiska undersökningar Tractatus Logico – Philosophicus. Thales: Stockholm
Översättning av Martin Gustafsson och Lars Hertzberg
Tecken och tydning: till konsternas semiotik.
Stockholm: Pan, s. 114 – 130

5. Preucel, Robert W. (2006). Arkeologisk semiotik

6. Hegel, G. W. F. (1987). Förnuftet i historien. Lund: Lundabygdens acupress.

7. Heidegger, M. (1987). Konstverkets ursprung. Göteborg: Daidalos.

8. Husserl, E. (2002). Fenomenologin och filosofins krig. Stockholm: Bokförlaget Thales.

9. Nietzsche, F. (2007). Så talade Zarathustra. En bok för alla och ingen. Têbinî: hemû çavkanî nehatine nivîsandin.
Stockholm

26.03.2023

***Maruf YILMAZ: doktoremend, lêkolîner, zimanzan**

LI TIRKIYEYÊ REWŞA ZIMANÊ KURDÎ

 Bahadîn Robar

Berî sed salan dema komara tirk hatî avakirin hindik û qels jî be di Deştûra Bingehîn ya sala 1921'ê de qala xweseriya kurd û Kudiştanê hatibû kirin û soza ku wê kurd û tirk di bin ewlehiya Deştûra Bingehîn de çand û zimanê xwe bijîn û bipêş bixin hatibû dayîn. (vê Deştûra Bingehîn deştûr dida kurdan ku jiyan, bawerî, kevneşopî, çand, ziman û taybetmendiyên xwe bijîn û xwe bi xwe rêve bibin, ango xweser bin.) Ligel ku gelek serok, rêveber serkirde û rewşenbîrên kurd ên wê serdemê baweriya xwe bi sozên M.Kemal û desteya wî neanîn û doza Kurdiştanek serbixwe kirin jî piraniya kurdan li ser xîm û baweriya biratiya îslamê piştgiriya dek û dolabên serkirdeyên tirk kirin û di encamê de 24'ê tîrmeha sala 1923'yan li bajarê Swîsre Losanneyê (Lozan) tirkan di bin serkêşîya Ismet Onûnî de parastina sînorên komara tirk ên îro xistin bin garantiyê û piştî 3 mehan yanî di 29'ê cotmeha sala 1923'yê Komara Tirk hat avakirin. Piştî komar hat avakirin di sala 1924'an de dewleta tirk Deştûra Bingehîn ya sala 1921'ê ji meriyetê derxist û di sala 1924'an de ji nû ve Deştûra Bingehîn li ser înkâr û tune kirina kurdan çêkirin. Ev Deştûra Bingehîn a ku herkesî weke tirk dibîne û dihesibîne hemû gel, bawerî, ziman, çand, cihêti û cudatîyên civakê tune û heta weke guneh û tewan dihesibîne. Di Deştûra Bingehîn ya sala 1961'ê û ya sala 1982'yan de jî ev xalên înkâr û îmhayê diwartir kirin. Weke mînak; di Deştûra Bingehîn ya sala 1961'ê xala 54. de dibêje; 'Her kesê ku bi girêdana hemwelatîbûna dewleta tirk ve girêdayî ye tirk e'. Di Deştûra Bingehîn ya sala 1982'yan de xala 66. de jî dibêje; 'Her kesê ku bi hemwelatîbûna dewleta tirk ve girêdayî ye, tirk e.

Dîsa di Xala 3. de dibêje; «Dewleta Tirkiyeyê bi welat û milletê xwe ve yekpare ye ku nayê parçekirin. Zimanê wê tirkî ye.» Avaniya dewleta unîter a li ser bingeha yekane zimanê fermî tê qebûl kirin.

Xala 42. Dibêje; «Di saziyên perwerde û hîndekariyê de ji bilî tirkî tu ziman ji welatîyên tirk re wek zimanê dayîkê nayê hînkirin û perwerde pê nayê dayîn». Xala 42. Di bendeke din de dibêje; ‘‘Tu kes ji mafê perwerde û hîndekariyê nayê bêpar kirin. Çarçoveya mafê perwerdehiyê bi zagon û rêzîknameyê tê diyarkirin. Perwerde û hîndekarî di bin çavdêrî û kontrola Dewletê de, li gor prensîb û reformên Atatürk, li gor prensîbên zanîst û perwerdehiya nûjen tê kirin. Cihên perwerde û hîndekariyê yên li dijî van esasan nayên vekirin’’. Qaşo dibêje mafê herkesî heye ku perwerdehiyê bibîne, lê bi awayek sinsî û şeytanî di benda din de dibêje divê ev mafê pewerdeyê li gorî sînor û pîvanên hatine diyarkirin bin. Yanî bi tirkî bin.

Ji sala 1910’ê heta salên 1980’yan Îtihat Terakî, Hizba Komarê a Gel (Cumhuriyet Halk Firkasi) Partiya Komara Gel û hemû partiyên bûne desthilat qedexe û asîmîlasyona li ser zimanê kurdî berdewam kirin. Di salên 1930’î de kesên ku bi kurdî bi axivîyan cezayê diravan li wan dihat birîn. Ji hemû hêlan ve polîtîkayên bijaftinê li ser kurdî meşandin.

Di sed salên Komara Tirk de ji bilî Destûra Bingehîn bi sedan zagon, giştîname, ferman û biryarên ku di serî de çand û zimanê kurdî û zimanê gelên din qedexe dikin hatine derxistin û weşandin û pêkanîn. Di van zagon, giştîname û pêkanînan de navên gund û bajarên Kurdistanê, çem û çiya, navê herêm û deveran hemû hatin qedexekirin û li şûna wan navên tirkî hatin danîn. Navên zarokan ên kurdî tev hatin qedexekirin.

Weke me li jor jî destnîşan kirî madila û înkara li kurdan û çand û zimanê kurdî heta destpêka salên 1990’î bi awayek fermî berdewam kir. Piştî têkoşîn û serhildanên salên 1990’î dewleta tirk neçar ma ku

hebûna kurdan û çand û zimanê wan nas bike. Bi têkoşîn berdêlên mezin kurdan li Bakûrê Kurdistanê heta aştêkê ev qedexe, înkâr û guvaşên li ser çand û zimanê xwe bêwate kirin. Ji salên 90'î şûnde her çi qas zimanê kurdî bi zagonî nehatibe înkarkirin jî qedexe û înkara li ser axaftin, nivîsandin, perwerde û hîndekariya bi zimanê kurdî bi awayek operasyonel (pratîkî) domiya û heta roja me jî ev rewş berdewam e. Heta roja îro jî di Destûra Bingehîn a tirk de naskirina kurd, zimanê kurdî û erdnîgariya Kurdistanê nehatiye pejirandin. Her sal bi dehan şano û konserên kurdî têne betalkirin û qedexekirin. Weke mînak; di sala 2022'yan de konsera Mem Aarat a li Bursayê hat qedexekirin, herwiha li Kocaeliyê konsera Aynûr Dogan hat qedexekirin. Di 2023'yan de konsera Kasim Taşdoğan bi heman bahaneyên pûç hat qedexekirin. Bi dehan caran hunermendên kurd ên li kolanan hunera xwe pêşkêş dikin li rastî êrîşên faşîstan hatin. Herî dawî hunermendê kurd yê bi navê Cihan Aymaz ku li Stenbolê di kolanê de ştrênên kurdî diştira ji hêla nîjadperestek tirk ve hat qetilkirin. Her sal em bi sedan bûyerên faşîstan ên weke êrîş, gef û dijiwariyê ku ji ber axaftin û ştrandina kurdî pêk tînin dibînin û dibihîzin.

Dema parlamenterên kurd dixwazin di meclisê de silavdaneke bi kurdî bikin dengê mîkrofona wan tê birîn û axaftina wan jî weke “bi zimanek nayê zanîn axivî” derbasî girêbestan dikin. Dewleta tirk di sala 2016'an de hemû kanalên televîzyonan ên kurdî, hemû sazî û dezgehên kurdî, dibistanên taybet, rojname û ajansên nûçeyan, di dawetan de ştrandina ştrênên kurdî û her tiştên di derbarê zimanê kurdî de bi giştînameyekê qedexe kir û dest danî ser alav û amûrên wan. Ev tam sed sal in li ser çand û zimanê kurdî ev pêkanînen dijmîrovane tînin meşandin.

Di destpêka 1920'an li 22 bajarên Kurdistana Bakûr axaftina bi zimanê kurdî ji % 95'an jortir bû. Lê li gorî lêkolîneke şirketa lêkolînan ya bi navê Rawest her sala paştir axaftina bi zimanê kurdî kêmtir dibe û ev rêje daketiye %40'î. Li gorî lêkolîna şirketa lêkolînan Rawestê li Kurdistana Bakûr kirî piraniya dayîk û bavên kurd dixwazin zarokên wan perwerde û hindekariya kurdî bibînin bes hewldana ji bo vê yekê 13/ e. Ji her çar kesan kesek ji bo zarokên wî bi kurdî bê perwerdekirin tu hewldanan nake. Bêgûman ev jinber pêkutî û gefên dewletê yên li ser kurdî ne. Li gorî vê lêkolînê axaftina dê-bavan ya bi dê û bavên (dapîr û bapîr) xwe re ji %48 e bes ev rêje di axaftina zarokan ya bi dê bavan re dadikeve %13'an. Yanî em dikarin bêjin li Bakûr êdî piraniya dapîr û bapîran nikarin bi neviyên xwe re biaxivin. Lewre nevî bi kurdî nizanin û dapîr û bapîr jî bi tirkî nizanin.

Siyaseta kurdî ya li Bakûr ji bo pêşî li asîmîlasyonê bigire rol û mîsyona dikeve ser milê xwe baş pêk nayne. Di hêla hişmendî û hişyarkirina civakê de hewldan gelek kêmtir in. Partiya HDP û pêkhateyên wê siyaset û xebatên xwe piranî bi zimanê tirkî dikin ev jî zimanê tirkî di nava gel de rewa dike. Dewlet jî ji vê rewşa tebatî (pasîf) ya siyaseta kurd hêzê digire û guvaş û tundîtiya li ser zimanê kurdî diwartir dike.

Dayîk û bavên ku hişmendiya kurdewarî bi wan re çênebûne bi bahaneyên weke dê zarokên me di dibistanan de li paş bimînin, dê dewlet nehêle bibin karmend, ku zarok bi kurdî biaxivin dê li rastî dijarî û cudakariyê bînin, berê zarokên xwe ji zimanê kurdî badidin. Derveyî vê yekê gelek malbat û zarok û ciwan jî di bin hişmendiya probagandaya dewletê ya ku dibêje; axaftina bi zimanê kurdî paşverûtî û cahêlî ye, de dimînin. Gelek malbat jî ji ber ku zimanê kurdî li

Bakûr û li Tirkîyeyê ne zimanê fermî ye û perwerde, bazirganî û bi awayek radîkal siyaseta pê nayê kirin û ne deriyê debarê ye bi fikara ku dê zarokên me bêkar û bû debar bimînin zarokên xwe naşînin kursên taybet ên zimanê kurdî û wan ji sazî û dezgehên kurdewarî dûr digirin heta di nava mala xwe de jî bi zarokên xwe re bi tirkî diaxivin.

Li Bakûr gelek sazî û dezgehên weke komele, akademî, enstîtû û waqîf ên ku li ser zimanê kurdî lêkolîn û xebatên giranbiha dikin hene. Di van dezgehên de gelek nivîskar û rewşenbîr jî hatin gihandin. Rêjeya xwendin û nivîsandina kurdî gelek pêş keftiye, bes li beramberî wê jî di hêla axaftina kurdî ew qas paşkeftin heye. Lewre her roja paştir axaftina kurdî kêmtir dibe û ya tirkî zêdetir dibe. Heya li gorî lêkolînekê li Bakûr axaftina bi zimanê kurdî daketiye ji %40'î. Bajarên weke Ezirom. Xarpêt, Sêwas, Gurgum(Mereş), Ezirgan, Meledî, Erdexan û Dîlokê ev rêje di bin % 10 'î de ye. Li Şîrnex û Colemêrgê axaftina bi kurdî ya di nava malê de ji % 8590/ e. Zimanê kurdî weke berfa li ber tava havînê her roj û her kêlî dihele û her dihele.

ZIMAN, ÇAND û ERDNÎGARÎ

Xiwînerên birûmet, di vê gotara xwe de ez ê hewl bidim peywendî, girîngî û bandora ziman, çand û erdnîgariyê rave bikim. Lewre ji berî ez bikevim nava mjarê ez dixwazim bi gotineke pêşîyan a binîrx û watedar derî li mijara xwe vekim. Ev gotin wiha ye; «Dar li ser koka xwe, mirov li ser zimanê xwe şîn dibe». Ev gotina pêşîyan bi me dide zanîn ku ka zimanê dayîkê çi qas girîng e û herwiha divê di xak û welatê xwe de azad û serbest bijî. Nîşan û heyînen herî diyarde ku mirov û sewalan ji hev cuda dikin bêgûman ziman û raman e. Me

berê jî di gotar û şîroveyên xwe de qala jihevbandorbûna ziman û ramanê kiribû. Heke ziman bi pêş neketa raman jî bi pêş nediket. Herwiha pêşketina ramanê jî girêdayî zimên e. Çi qas raman pêş ketibe ew qas ziman jî bi xwe re bi pêş xiştiye. Vêca piştî mirovên pêşîn li her çar aliyên cîhanê belav bûn, her qebîleyekê ji xwe re welatek hebandin û bi hezaran salan li ser heman xakê jiyana xwe berdewam kirin, bi wê xakê re girêdan û hevşîbîneke wan a di asta genê de çêbû. Ango mirov jî mîna riwek û ajalan têkildarî ax, avhewa û xwezaya ku tê de dijîn, li ser heman kod û heman taybetmendiyan diafirin (çêdibin), mezin dibin, dijîn û li ser heman kevneşopiyê reng û tovê xwe vediguhezînin peyrew û nifşên şûn xwe ve. Çawa ku dara xurmeyê li Swêd û Norwêcê şîn nabe, ku şîn bibe ber nagire, û ber bigire jî tehm û çêja wê nîn e. Mirov jî wisa ne. Yanî her qewm û neteweyek rengê axa welatê xwe digire û bi her awayî dişibe welat û nijada xwe. Jixwe ev rêgezeke jiyanê ye.

Mirov û bi taybetî jî kurd gelek dilsoz û girêdayî axa xwe ne. Ev dilsozî jî peywendiya wan a bi axa wan re nîşan dide. Ji ber ku li gorî zanîsta arkeolojiyê gelê herî pêşîn niştecih bûyî û têgeha welat û zimanê aîdê xwe afirandî bêşik û gûman pêşiyên kurdan in. Herwiha heta îro jî em kurd weke nêviyên afirîner û damezirînerên serdana neolîtîkê hê jî li ser heman erdnîgariyê û li ser bingeha heman çandê dijîn. Lewre girêdana kurdan ya bi ax û welatê wan ve naşibe ya tu gel û neteweyên din. Heta ez dikarim vê jî lê zêde bikim. Dema kesek kurd li deverekê an jî li welatekî biyanî dijî ji xizma û malbata xwe re wesiyet dike û dibêje; dema ez mirim cenazeyê min bibin li ser axa bav û kalên min veşêrin. Yanî mirovek mirî jî be dixwaze li ser axa xwe be. Kurdan di vê hêlê de jî gelek gotin û biwêjên giranbiha bikar anîne. Gotinên weke, Ax dayîk e, dayîk ziman e. Ziman tov, mirov

şov e û hwd. girîngiya zimanê xwe vegotine. Kurd ji berî hemû gel û neteweyan derbasî jiyana niştecihî bûne û bênavber va ye 12 hezar sal in ku hê jî li ser heman axê yanî li ser heman welat û erdnîgariyê dijîn. Ev jî girêdan û dilsoziya bi welêt û çand û zimên re xurtir û qewîntir dike. Lewre di her bihosteke axa Kurdistanê de bîranîn û şûnmayîkeke kurdan heye. Her sed metere erd bi navekî xweserî taybetiya xwe hatiye binavkirin. Yanî her zevî, girik, kortik, berwar, kaş, ro û co, raştik û newal û hwd. ji hêla pêşiyên kurdan ve hatine binavkirin û pênasekirin.

Bêhna pêşî û zimanê wan ji axa wan tê. Ji bo vê yekê ax ji bo kurdan dayîk e. Dayîk jî dayîka her tiştî ye, lê belê ji her tiştî zêdetir dayîka zimên e. Lewre tenê ziman bi têgeha dayîkê ve bêtir ku ji hev veqete tê bikaranîn. Yanî têgeha zimanê dayîkê, zimanê zikmakî nîşaneyê vê yekê ye. Di vir de ez dixwazim peyva "Mak" jî kurtasî şîrove bikim. Di esasê xwe de têgeha esasî ya ji bo dayîkê tê bikaranîn «mak» e. Lewre hema hema di hemû zimanên Hînd Ewropî de weke; Ma, mama, Mutter, mother, maîka, mayrîk, madre û hwd. e. Heta di zimanê kurdî zaravayê kurmancî de «mak» û di kirdikî de jî "ma(yê)" tê gotin.

Mîrov û bi taybetî jî zarok tov in. Her cure tov li ser her cure axê şîn nabe. Lê devera ku tov lê şîn bibe mîrov çî tovî biçîne mîrov dê berê wî tovî jê hilîne. Ziman jî wisa ye, tu kîjan zimanî bikî zimanê jiyana zarokên xwe tu wê nifşek welê bibînî. Yanî mîrov bi kîjan zimanî bi zarokên xwe re biaxive dê zarok bibe ji netew û nîjada wî gelê ku bi zimanê wan mezin bûye. Her çî qas ji koka xwe kurd be jî, ew dibê tişteke din. Weke dara fîstîqan a ku kezwan lê hatî fîtrûmkirin, her çî qas koka darê fîstîq jî be ber û berhema wê êdî kezwan e. Vêca kurd dibêjin; «Ziman dayîkniştîman e». Niştîman ango welat, rengê

netewe, gel, civak û etnîkan pêk tîne û wan li gorî taybetmendiyên xwe dike di şêwe û formeke xweserî xwe de. Lewma kesek ji welatê xwe dûr bikeve an jî bi sedemên cur bi cur hatibe dûrxistin ew kes ji hemû reng, tehm, xweşî, taybetmendî, kevneşopî, hebûn û heyîna welatê xwe ya ku bi sedan û heta bi hezaran salan ta bi ta, kêlî bi kêlî, gav bi gav û bi xwîn û xwîdana milyonan kesan çêbûye û bûye nîşaneyên wî gelî yên sereke û bingeînê dûr dikeve û jê bêpar û bêhay dimîne.

Ew kesê ji ax û zimanê xwe hatî dûrxistin û pêparhiştin mîna masiyekî di binê birkek bêav de ku piştî çend xulekan êdî nikare henaseyê (nefesê) bide û biştîne, wisa ji hemû rayên jiyana xwebûnê qut dibe û mirinek spî (çandî, rûhî û sosyolojîk) di giyan û jiyana wî/wê de rû dide. Mirov dikare gelek sedem û mînak ji bo vê yekê nîşan bide, bes ez dixwazim tenê vê bêjim; mirov li kîjan welat û erdnîgariyê û di nava kîjan civak û neteweyê de bijî mirov li gorî reng û taybetmendiyên çand, ziman, kelepura û rêûresma wan teşe digire û wisa jî dijî. Her çî qas mirov weke nifşa yekem di hişmendiya netewe, ziman û çanda xwe de be û hewldanên wan ji bo vê yekê hebin jî dibe heta demekê ew di hêla çand û ziman de serkeftî jî bin, lê nifşa duyem û di nifşa sêyem de tenê weke çîrokekê wê bê gotin ku; em demekê ji Kurdistânê hatibûne û bav û kalên me kurd bûne. Yanî em wiha zelaltir bêjin. Piştî 3040- salan kesek kurd ê ji welatê xwe derketî wê ji xwebûn û hebûna xwe ya neteweyî, çandî û etnîkî %7080- winda bike. Herwiha wê % 7080- jiyanek biyanî ku çand û zimanek biyanî û serdest di jiyana xwe de çêke û bişibe wî gel û welatê ku têde dijî û wî zimanê serdest jî mîna zimanê xwe dayîkê bibîne û wisa nêzîk bibe.

Ji bo welatek hatî dagirkirin jî rewş nêzî vê tesbîta me li jor kiriye. Heta ji bo welatê me (Kurdiştan) ev rewş diwartir e. Di welatên biyanî de desthilatdarî karê entegrasyonê dikan, yanî hebûna wan red nake, bes dixwazin biyaniyan bişibînin xwe û çand û zimanê xwe li wan bidin hînkirin, lê li welatên mêtîngeh yanî li Kurdiştanê (kolonyal) metînger û dagirker ne tenê entegrasyonê dikan, ew rasteraşt asîmîlasyonê dikan. Ji asîmîlasyonê jî wêdetir çand û zimanê kurdî madila (denial, înkâr) dikan. Ji pêşdibîştanê heta zanîngehê û di hemû saziyên dewletê û yên sivîl de, heta di saziyên fermî û ne fermî ên olî de (mizgeft, diyanet, ilahiyat, mescit, kursên hînkirina Quranê û hwd.) jî bindestan (kurdan) neçarî çand û zimanê xwe dikan. Derveyî vê yekê tu şans û riyeke din ya jiyanê nadin bindest û niştecihan (kurdan). Ji ber ku zimanê dayîkê pira di navbera rabirdû (raborî) û pêşeroja gelan de ye serdest dixwazin vê pirê ji holê rakin. Kesê bi zimanê zikmakî (dayîkê) mezin nebûbe û nikaribe û nizanibe bi zimanê dayîkê biaxive, ji rabirdûya gelê xwe qut dibe, tu taybetmendî û dirûvên netewe, gel û nîjada wê/wî pê re namîne. Lewre wî/wê kesî pira di navbera xwe û rabirdûya xwe de ji holê rakiriye û deriyê xwebûnê li ser xwe kilît û mifte kiriye û êdî gelek zehmet e ku ew bikare bibe “xwe”. Ji ber vê sedemê ax û welatê mirov di heman demê de destûr, dîploma, mîsogerî û tekane riya paraştina zimanê mirov yê zikmakî ye.

Xweparaştina neteweyî di hebûn û pêşvebirina zimanê zikmakî de ye. Jixwe mebesta serdest, dagirker û nîjadpereştan ya herî mezin û sereke ew e ku gel û etnîkên cuda tune bikin. Ji bo tunekirina gelekî (weke kurdan) ya fizîkî hêza tu dewlet û artêşên herî mezin û xwînmiy jî têrî nake. Bes bi asîmîlasyon, înkâr û qedexekirinê ev armanc pêk tê. Lewre filozofê mezin ê Çînî Konfuçyus dibêje; Ji bo

qedandina (jiholêrakirin) gelekî pêwîstî bi çekan nîn e, tenê zimanê wan li wan bidin jibîrkirin bes e. Di roja me de dewletên dagirker û bi taybetî jî dewleta tirk hemû rê û rêbazan ji bo jiholêrakirina kurd û kurdî û Kurdistanê bi kar tîne. Heta astekê di vê polîtîkaya xwe de bi ser jî keftiye. Bi vî awayî gelek gel ji holê rabûne û gelek jê jî li ber tunebûnê ne.

Weke mînak di serdemên berê de gelê qiptî li Misrê serdest bûn û heta em dikarin bêjin, li gorî angaştên wan ew peyrew û neviyên Firêwnên Misrê ne. Yanî gelê wî welatî yê herî qedîm e, bes îro ji serjimara Misrê ya xwe weke qibtî diyar dikin tenê ji %10 e. Di nava gel de zimanê qibtî êdî nema tê axaftin û sed mixabin tenê di rîtûelên olî de zimanê qibtî tê axaftin. Ligel ku ola gelê qibtî Ortadoks e û ola erebên Misrê îslam e jî (dema ola gelê derdest û gelê bindest yek be aşê bişaftinê bibandortir dizivire) gelê qibtî ji %10 dibêjin em qibtî ne jî bi zimanê qibtî bikar naynin û hêdî hêdî ji ser dike dîrokê dadikeve xwarê. Lewre em dibêjin; heke gelê bindest bi awayek dilxwazî û bi hêz û derfetên xwe zimanê xwe neparêze dê ew ziman û axêverên wî zimanî dawîya dawî ji holê rabin.

Mînakek din em ji Efrîqayê bidin. Nîjerya welateteke efrîqayê ye demek direj weke mêtîngeha Brîtanyayê maye. Ligel gelên vî welatî ne ji malbata çand û zimanên Hînd-Ewropî ne jî zimanê vê dewletê ye fermî jî inglîzî ye. Zêdetirî 500 zimanên xwecîhî li vî welatî hene an jî hebûn. Di nava van zimanan de herî zêde sê ziman ji aliyê niştecihan ve têne axaftin. Ev ziman jî Haûsa, Igbo û Yorûba ne. Her çî qas 500 ziman li vî welatî hebin jî ji ber ku ji hêla dewlet, sazî û dezgehên sîvîl û axêverên wan ve ev ziman di rêza duyem û sêyem de tenê hiştin û girîngî pê nayê dayîn piraniya wan tenê ji hêla kom û kesên hindik ve tîn bikaranîn. Ew kesên pê van zimanan diaxivin

jî an pîr û kal, lêkolîner û kesên dûrî bajar û dibistanan in. Lewre li Nijeryayê êdî her kes çand û zimanê îngilîzî esas digire û ji xwebûn û raştiya xwe dûr dikeve. Sedema vê yekê jî metîngerîya Keyayên Yekbûyî (Brîtanya) ya salên dûvdirêj bû ev welat metîngeha wê bû. Yanî polîtîkayên dewletê û zimanê serdest kod û rêça zimanên xwecîhî da windakirin û zimanê xwe li ser wan ferz kir, lewre êdî zindîkirina van zimanên xwecîhî karek gelek zor û zehmet e.

Vaye sed sal in dewletên serdestên Kurdistanê vê yekê dikin. Heta dewleta tirk ji sînore xwe derbas bûye û li Efrîn, Girê Spî, û li Serêkaniyê jî zimanê kurdî qedexe kiriye û zimanê tirkî li ser kurdên xwediyê wê xakê ne ferz kiriye. Yanî tiştê vaye sed sal in li Bakurê Kurdistanê dike îro li Rojavayê Kurdistanê jî dike. Heta destê xwe dirêjî Başûr jî dike û hejmarek mezin ciwanên Başûr axaftina bi zimanê tirkî weke pêşketinekê dibînin û hîn zimanê tirkî dibin. Serdestiya nijadek cuda û faşîst azadiya zimanên xwecîhî ji holê radike.

*** Rêveberê Komîteya Pena Kurd ya Elmanya**

Eskere Boyik, dramatûrg, helbestvan û nivîskarekî kurd

 Jiyan

Eskerê Boyîk (Askiyar Broyan) 31ê tebaxa sala 1941ê li gundekî kurdayî navça Ermenîstanê ya Axbaranê: Qundesazê (niha Riya Teze li herêma Aragasotinê) malbeteke êzdî da hatîye dinê.

Piştî tamamkirina dibistên gundê xwe û gundê cînar Elegezê ew sala 1961ê înstîtûta Malhebûna Gundîtîyê ya bajarê Yêrevanê da tê qebûlbûn û sala 1966an bi qîmetên here bilind dawiyê li wê tîne. Demekê li înstîtûteke zanyaryê-lêkolînê ya Yêrevanê da wek pêşekzanê sereke dixebite, paşê Înstîtûta zanyaryê ya Aboriya Malhebûna Gundîtîyê da dikeve Aspîrantûrayê (xwendina şandina dereca doktoriyê).

Sala 1974a têza doktoriyê diparêze û navê doktorê aboriyê diştine. Wî kivş dikin wek serokê beşeke wê înstîtûtê. Tevî karê zaniyaryê ew wusa jî gelek sala Zanîngeha Yêrevanê ya Malhebûna Gundîtîyê da dersê rêvabirina (serkarîkirina) malhebûnên gundîtîyê dide. Di warê zaniyariya aboriya gundîtîya Ermenîstanê da xudanê devedevî 40 xebatê zanyarî ye.

Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyêtîyê sala 1993a dest ji kar û barê xwe berdide, diçe Komara Qazaxîstanê. Sê sala li wir dimîne û pey re berê xwe dide Ewropayê û li Almaniyayê bi cî dibe, wî derê jî hetanî roja îroyîn karê xwe yê nivîskariyê, zanyariyê, civakiyê dimeşîne, lê êdî bi temamî di warê edebiyat, çand û dîroka kurdî da. Her çiqas jî, di warê zanyariya aboriya malhebûna gundîtîyê da bicîanîna lêkolînên zaniyariyê û perwerdekirinê da barekî giran hilgirtibû û bi serketn dimeşand, lê wî li nav xwendevanên kurd da weke helbestvan, diramatûrg, rojnamevan, pûblîsîst deng dabû.

Eskerê Boyîk bi ruhê xwe ve helbestvan e. Di salên karê ewlin da wî bi xwe jî tê derdixîst, ku karê wî edebiyat ye, jiyana wî da şaşî çêbûye, ku bêşekî din bijartîye, lê çiqasî jî dixwest şaşiya xwe serraşt bike, nikaribû. Ji ber ku tu nivîskarê kurd li Sovêtîstanê nikaribû tenê bi

nivîskariya kurdî ebûra(debara) xwe û neferên xwe bike. Ji bo vê yekê jî, ez dixwazim Eskerê Boyîk weke fênomênêkî bi nav bikim, çimkî bilî karê xwe yê fermî, yê di warê bi zanyarî çareserîkirina pîrsgirêkên aboriya gundîtiya komara Ermenîstanê, wusan jî bi serketin rêya kar û barê edebiyat û çanda kurdî da dimeşya.

Ev karê dawî Eskerêdî bi saya xwegîhandin, xweperwedekirina di warê ziman, edebiyat û çanda kurdî da bi cî danî. Tenê ji piştî sala 1993a re gava ewî Ermenîstan pişt xwe va hîşt, ji pey gelek zehmetiyan jê re îmkân û fersend çê bûn ku ew xwe bi temamî nivîskariyê, kurdzaniyê, bi taybetî bicîanîna lêkolînên di warê dîrok û dîne kurdên êzdî va mijûl bike.

Ji alîkî va vê welatvanî û hogirtiya nêzîk û helal ya navbera min û Esker da ez difendim berbi cîanîna peyveke xweş û germ ji bo sersala wî, aliyê dinê va eynî tiştê ez bi pisîkoloji hetanî warekî bend dîkirim, ku dibe hinek bêjin Wezîrê Eşo jî ber wê yekê haqasî Eskerê Boyîk bilind dike? Ev fikir û ev tişt dilê min da disêwirîn gava jimara rojnemeke me kurdan ya hêja- „RÛDAWÊ „, ya 21ê tîrmeha îsalin ket ber destê min.

Di wê da hevpeyvîna Alî Gûler tevî hunermend-ştrambêjê kurdî bi nav û deng Nizamettin Arîç hatibû çapkirinê, ku zemanekî bi navê Feqiyê Teyran jî deng dabû. Hevpeyvîn derbarî weşena albûma Nizamettîn Arîç ya nû da bû. Di bersîva pîrsekê da hunermendê pîrşûret wa dibêje: “di nav kurdên Kavkas û Serhedê de cîhê Fêrîkê Ûsiv cuda ye. Helbestvanekî girîng e.

Di helbestên wî da cihaneke kûr û fire heye. Merivan ji xwe re dike heyîran. Raman û felsefa wî gelekî kûre. Eskerê Boyîk jî ne kême. Meriv dikare gelek bi hêsanî helbestên wan bike ştran”. Hevpeyvînê da tê agahdarkirin ku: “Albûma ‘Azadî’ ji 10 ştranan pêk tê. Hemû ştran jî

li ser helbestên kurdên Kafkasyayê Fêrîkê Ûsiv û Eskerê Boyîk hatîye amadekirin”. Navê albomê ji navê helbesta hogirê min Eskerê Boyîke ‘Azadî’ hatîye hildan. Van gotinên Nîzamettîn Arîç û vê agahdariya rojnemê şabûneke mezin xistin dilê min. Çawa şa nebî, ku du weletî û du hogirên te yê nêzîk, li dervayî sovêta berê jî tene naskirinê û keda wan bi hêjatî tê nixandî: ya Fêrîk û Esker.

Gava Esker, ji bo standina xwendina bilind sala 1961ê hatiye paytextê Ermenîstanê Yêrêvanê atmosfêra wir bi bîn û buxsa çanda kurdî va dagirtî bû. Evan salên pêşketina edebiyat, çand, hûner û kurdzaniyê yên here xweş bûn. Piştî salên 1937-1938a yên rêprêsyayên stalinîzmê salên 50î mecal û îmkân kurdariyê re berfire vebûn, îmkânê ji bo nû va welidandin, xuliqandina çanda kurdî çê bûn.

Em dikarin wê demê weke Ronêsans bi nav bikin, ku dişibiya Ronêsansa (Ewropa) Rojavayê ya berya çend sedsala. Yêrêvanê da dezgeh, rêxistin, hevaltî yên edebiyat û çanda kurdî, her wisa jî kurdzaniyê çê bûn: rojnema Riya Teze ji nû va hatiye weşandinê, weşanên radyoya Ermenîstanê bi zimanê kurdî ji Yêrêvanê her roj bi zemanê dirêj û kifşkirî hatin bi cîanînê, Înstîtûta Rojhilataniyê ya Akademiya Ermenîstanê ya Zaniyariyê da beşa kurdzaniyê dest bi karê xwe kir, di nava goveka Yekîtiya Nivîskarên Ermenîstanê da sêksiya nivîskarên kurd hatiye demezirandinê, weşanxana Yêrêvanê da beşa çapkirina pirtûkên kurdî hatiye vekirinê.

Em êdî derheqê wê yekê da nabêjin, ku dora wan dezgehan artêşek ronakbirên kurd civiyabûn. Bi dehan dûhatiyên wan hersal zanîngeh û înstîtûtên Yêrêvanê yên xwendina bilind temam dikirin. Her çiqas jî, Eskerê Boyîk xwe li perwerde û pêşî jî ji edebiyat û çanda kurdî xerîb girtibû, lê giyanê kurdîtiyê û kemala helbestvaniya wî ya xwezayî ew defandin nava refên ronakbirên kurd. Esker hewil da û zûtirekê ciyê

xwe yê anegor di nava artêşa ronakbiran da girt.

Helbestên wî yên yekemîn ser rûpelên rojnema Riya Teze û bi radyoyê bi zimanê kurdî hatin weşandinê. Lê sala 1966a berevoka helbestên wî ya ewlin bi navê “Şiverê” li Yêrêvanê hatiye weşandinê: pirtûk eynî weke şiverê tenik, lê warê hûnerê û naverokê da, eger em dikarin wa bêjin, qelaw û kûr bû.

Bi sebebên dervayî îrade û daxweza wî pirtûka wî ya duyemîn, piştî zemanekî dirêj, eynî bajarî da, sala 1975a bi sernavekî xweşik: “Kulîlkên Çiya” hatiye weşandin. Wê pirtûkê helbesta bi navûdeng da naskirin û çawa li nav xwendevanê kurd yên Ermenîstanê belav bû wusa jî ji sînore wê derve jî di nav helbestvanên genc da belav bû. Ji dervayî sînore Ermenîstanê li du welatên derva bi orgînalê xwe kurdî û bi wergera ser zimanê tirkî hatiye weşandin.

Heta niha ev pirtûkên wî çap bûne: HELBEST - “Şiverê” di sala 1966an de weşiya. - “Kulîlkên Çiya” di sala 1975 - “Duaya Serê Sibê” di sala 1997 - “Oda Çîrokan 1” helbestên zarokan di sala 1997 - “Kulîlkên Birîndar” di sala 1998 - “Govenda Herfan” helbestên zarokan - “Ez Kilameke Melûlim” - “Tîrênc”

Eskerê Boyîk helbestvanê dewrana me ye. Ji aliyê xwendevanan da hêjayî hizkirinê bûye. Diyarkirineke vê hizkirinê jî ewe, wekî me li ciyê pêwîst da jî kivş kir, ku hunermendekî kurd yê pirr hêja ne ku tenê helbestek lê çend helbestên wî kirîye stran. Şedetîke hêjatiya wî ye helbestvaniyê jî ewe, ku Esker cûre û peyva xwe ya xwexatyê anîye nava helbestvaniya kurdî, qet misqalekê jî şayîrên beriya xwe û yên zimanê xwe dubare nake.

Ew bi awazê xwe yê cuda û xisûsî dinivîse û xwendevanên, ku pîrî-hindikî haya wan ji poyêziya helbestvan heye, gava helbesteke wî ya nû, bê kifşkirina navê wî dixûnin- dest xweda serva diçin ku ew helbesta

Eskerê Boyîk e. Govek, sînore gotarekê mecalê nade, ku em dûr û dirêj bi hûrgilî heralî ser analîzkîrîna poyêziya Esker rawestîn. Ber wê yekê jî emê her bi tenê bi xetên giştî, tomerî û bi meselên kêmjimar poêziya wî raxin li ber çavan û binirxînin. Helbestê Eskerê Boyîk nazikin, ewazê wan tê bêjî ji perê kulîlkê çiya pêk tên, tije rem, germayî û kela jiyanê ne:

Kuliyê nazik Kuliyê berfê Nerm dibarin Têne erdê.

Usa qerqaş, Usa amin, Mîna têtê Porê dya min.

Tên dipêçin, Çiya, baniyê min Ku ber sermê Necemidin.

Ew dengbêj û evîndarê cihanê, xwezayê û xweşikbûnê ye. Tê bêjî ew bi germayî û hizkirîna dilê xwe, heta bi ‘porê dayka xwe’ dixweze serma zivîstanêda cihanê germke. Lê gorî xeysetê xwe yê şermoke ew evîndariya xwe berbi evîna xwe, ya cinsî, yanê ya himber qismî jinê kêr, degme eşkere dike, bi awayê alîgoriyayê xwe nêzîkî evîna xwe dike. Em mînakekî bînin:

Havînê sî xweşe Zivîstanê-tav Biharê sî û tav Hemêz dîkin hev...

Ez sî me, Tu-tav, Were, domam, bihare Em bigihîjne hev.

Çiqas xweş, çiqas bi hûner û helbestvaniyê ya bilind hatiyê gotinê. Helbestvan xwe wek “sî” lê evîna xwe jî wek “tav” nav dike. Berhev-danîneke çiqasî bi cî û bedew ji bona kirîn û xweşikirîna dilê keçikê. Felsefa poêziya Esker gelekî kûr e û bi pêra jî di aliyê moraliyê û pisî-kolojiyê da pir tehsîrdare. Ew vê helbesta kurt da wê fikirê îlan dike, ku civaka mirovayê da cinsê mê û nêr nikarin bêyî hev bijîn, loma jî bihara jiyanê bi ji hev hizkirinê, evîndariyê û amintiyê xweşe.

Helbesteke biçûke din:

Ezê hildim îro vê Dara bîêye beyanî, Hubirêda kim dilê xwe ra Nav esmanê şîn-sayî Nemê tera binivîsim Li ser pala vî çiyayî: -Tu jî derê ber dêrî Ku min bibe ronayî.

Helbestê tê bêjî dîdemekî suruştî ya bedew e. Dîdemek, ku tenê efrandîna Eskere... Helbestvan evîndarê xezayê, çiya û baniya, mêrg-çîmanan, kaniyên avsar û zozanan e. Zarotiya wî paşla wê xwezayê da derbas bûye. Dilê wî heta li ser hemû giyanberan, ajalan, rewiran, terewil û teyredên li nav wê xwezayê da jî dêşe.

Berf barî rê û dirbê Çiyê xitimîn, Mij û dûman hatin serê Riya kimkimîn. Xezal, kêwrûşk, gur û rûvî Li çiyê man, Em vegeryan, gelo ça bû Halê wan?

Helbestvan xwendevan jî bi xwe re dike heyr û motac, evîndarê xwezaya bi jiyan û jiyanber. Ev şuretên hunermendiyê û hostatiya berhemdayînê, efrandariyê ye, bi sêwirandina xiyal û mitalên di nav xweşikaya jiyanê da tînan temam kirinê. Bêy vê faktora jiyanî bi tenê hostatiya helbestvan nikare tesîrê li ser giyana xwendevanan çê bike. Ev herdu keremên Xwedê jî jî Esker re hene. Têma evîna berbi dê-bavê, kalikê di nav helbestên wî da çiyê xweyî girîng digre. Tê bêjî rem, hizkirin, germayî, paqijaya ruhî jî wan helbestan dibare.

Gelek helbestvanên kurd xwe di warê sêwirandina helbest, poeziya welatevîntiyê û miletevîntiyê da cêribandine. Eva tiştêkî metelmayînê nine, gava em qedera gelê xwe ya dîrokî ya pir giran, ya tirajîk digrin ber hesab, ber çavan. Lê bi bawariya min helbesteke vê babetê ya herebaş, ya here bi hunura helbestvanîyê bilind, ya naveroka xwe va gorî vê qedera gelê me Eskerê Boyîk raberî xwendevana kirîye:

Kê nifir kir ku em wa bin, Bê cî-sitar mîna gurê serê çiya bin, Mala xwe da em bêpar û em bê war bin, Cînar me ra ewqas nexwez û neyar bin.

Kê nifir kir ku cînarê xwe ra ewqas em helal bin, Ber zulma wan ewqas ker-lal û bêkar bin, Xwe ra xweyîn û dîn-dijmin, li hev nepak, qelp, bêtifaq, Wan ra xulam qûl û amin, pişt û yar bin...

Kê nifir kir, ku em awa tîş û par bin, Dora me tev çavê sar û mejûyê har bin, Rê jiyanê me ra ewqas zor û zemet û dijwar bin, Em jî ser riya, çav li derya, penaber û stûxwar bin.

Weke kifş dibe, li ber rewşa milete girane tirajîk helbestvanê dilnazik, diltenik, welatevîn ji kerba, ji qehra, ji îaca dilê xweyî kulî birîn rengan zêdetir, bêtir tîr û tarî dike, ku her bi tenê boyî we yekê bala me bikşîne ser kêmanî û şaşıyên nava civaka me kurdan da çêbûyî, ku em wana zûtirekê ji navê rakin. A bi vê fikirê hinek gotinên helbestvan yên tel û tûj, ku me kurdan re dibêje tê bêjî tên “xwerinê”, “daqurtandinê” û bi hesabê dewî- “fikirînê”.

Poyêziya Eskerê Boyîk ya welatevîntiyê xurte him bi jimara helbestan û him jî nemaze bi hunera wan ya helbestvantiyê. Em êdî wê yekê nabêjin, ku ew bi hişkî, bi tûndî dijî zor û zulma dagerkirên Kurdistanê radiweste, ya ku rojên me da berdewam dike. Awa tenê sernivîsên çend helbestên wî bi babeta welatevîntiyê-miletevîntiyê: “Heta kengê?”, “Ballad derheqa tifaqê da”, “Keser”, “Dilo bihare”, “Kurdistan” “Cimeta xwe re”, “Rêkviyem ser şihîdên Helebçê”, “Ewra bare xwe dagirtîye” û gelek gelekê din. Lê evîndariya wîye weletvaniyê xweşbînî ye. Ew bi şerdarya gelê xwe yê azadariyê da baware, bi hîvî û gumane ku gelê wîyî mêrxas wê serkeve û ji zulma dagerkiran rizgar be:

Ez zanim Kurdistanê çêbe, Azadî ala wê be, Edlayî tifaqa wê be Ez zanim Kurdistanê çêbe. Tavê qelema wê be, Çavê alemê lê be, Ez zanim Kurdistanê çêbe. Lawê Kurd egîte wê be, Îro be yanê sibê be, Ez zanim Kurdistanê çê be.

Berhemên Eskerê Boyîk yên pirozayê û şanogeryê jî balkêşin. Kurteçîrok, şano û romanên wî ji alyê xwendevana va bi hizkirin hatine pêşwezîkirin û qimetkirin. Rawestandina ser naveroka romanên wî (xazma “Xezeba Xwedê”) vê gotara sînorkirî da ne mimkûne, ber wê

yekê jî emê bi tenê kifş bikin, ku roman li ser doza tirajêdiya êl û eşî-reke kurdên êzdî hatîye sêwirandinê. Şanoyên “Sinco keça xwe dide mêr”, “Mem û Zîn”, “Birînê rojên Buhurî” ser dikayên tîatroyên kurdî yên Elegezê, bajarê Tilbîsê û li Almaniyayê demên dirêj hatine lîstinê.

Eskerê Boyîk ku perwerda xwe dibistan û zanîngehên ermenî da standibû, ber ku yên kurdî bi sebebên eşkere tune bûn, lê bû helbestvanekî kurdî bi nav û deng, xudanê kemala helbestvanîye bilind ev yek femdarîye, ber ku helbestvanî ji karakter (xeyset) û giyan, ji aqil û kemala wî dihat. Lê Esker, ku dibistan yan zanîngeheke kurdî ji dûr va jî nedîtibû, lê bû kurdzanek bi giştî, temamî û sipêsiyalîst (pêşekzan) lêkolîner di ware dîrok û ola beşeke gelê me kurden êzdî da eva êdî ciyê ecêvmayînê ye. Di vî ware zaniyariyê da lêkolînên hêja giranbiha cianîn û bi awayê gotar û pirtûkan dan weşandinê. Em jî ber sebebê li jêrê kifşkirî Eskerê Boyîk dikarin bihesibînin weke kurdzanekî xwegîhandî, xweperwerdekirî.

Sebeb çî bû, ku Eskerê Boyîk berê xwe da zanînen dîrok, civaknasî û ola kurdên êzdî? Belkî ji êzdiyatiya wî bû, ku ew bi xwe jî ji kurdên êzdî bû? Helbet, ev yek jî hebû, lê ew ne meniya bingeîn û ya tek-tenê bû. Sebebê bingeîn ew bûyê, ku dagerkirên Kurdistanê (civakî û olî), dijminên gelê kurd bi dewr û zemana ji bo desthilatdariya xwe Kurdistanê da biparêzin, xurtkin cudatiya olê bi kar anîne, dutîretî kirine navbera kurdên êzdî û musulman, ew rakirne rûyê hev, li hev kirine dijmin, li hev dane qirkirinê.

Heger em bi awayekî dine jî vê fikirê eyan bikin, dikarin bêjin, ku eynî dagerkiran, eynî dijminan ola misilmantiyê, ku piraniya gelê kurd dabûn qebûlîkirinê dijî menfet, berjewandiyên gelê me bi kar anîne, ku hetanî îro jî ew siyaset berdewam e. A, ji ber vê yekê jî bilî, ku lêkolîna ola êzdîtiyê ji aliyê zanyariyê da pêwûst bûye, ew her usa jî têma, ba-

betekî aktûêl bûye ji bona lêkolînanan û di nav wan da bona yekî weke Eskerê Boyîkî miletevîn.

Bi raştî jî çima ewqas ferman li êzdiyan hatine rakirin, çima êzdî hatine kokbirkirin, çima êzdî ji aliyê birayên xwe kurdên musulman va hatine zêrandin, heramkirin, heta nan û destkuja wan jî nexwerine? Çiye sebebê vê koçberî û reva kurdên êzdî ji welêt? Êzdî ku bawarya xwe da ewqas berkin, çima misilmanî, wan wek “bêxuda” hela carna jî “kafir” nav dike? Çima hinek êzdî ji netewa xwe direvin û dibêjin “Em kurd nînin”? Sebebê dîndijminatîya di navbera kurdên misilman û êzdî da çiye? Eskerê Boyîk di pirtûka xwe “Êzîdiyatî, Mîrzîkê Zaza, Fermanên Reş”, lêkolîn û gotarên xwe din da ser hîmê çevkaniyên nivîskî, zargotinî û ayînî hewl dide bersîva wan pîrsa bide. Bersîv jî yeke: Dagerkirên Kurdistanê yên civakî û olî, ku kurdan û welatê wan bin destê xwe da xweyîkin ev “jera” dutîretiyê kirine nava vî gelî û ciyê dilêşiyê jî ewe ku her tiştî bi destê kurda bi xwe dikin: bi destê kurda mala wan, tifaq û yekîtiya wan wêran dikin.

Derheqa wê dutîretiyê ji aliyê zemîn da ya here nû, here dewî, ku ew jî bi xwe li Ermenîstanê bû şede, di lêkolîna xwe “Êzîdiyatî, Mîrzîkê Zaza, Fermanên Reş” da wa dinivîse: “Her kes bi evden bê pişt û bê tifaq dilîzin... Birek kurdên êzdî ketin tora partiyake ermeniya ya desthilatdar ya nijadpêrêşt, gotin: “Em kurd nînin. Êzdî kurd nînin”. Hinek jî bo berjewendiyên şexsî u qezenckirina navên erzan ketin li nav wê lîstîla qirêj, hinek jî bi dilê sax gihîştin wan... Pak bû xelkê bi alîkariya rewşembîrên wure kurd (li vê tangê raştir dibû Esker zelaltir bigota: “Rewşembîrên kurdên êzdî” ber ku yên kurdên musulman wî zemanî da li Ermenîstanê êdî ne mabûn.- W.E.) zû tê derxiştin, ku li bin wê lîstîkê da çi nêta xirab, veşartî heye û ji sedî pênc jî li pey wan “êzdiyan” neçûn “. (rûp. 6). Piştî wê Eskerê Boyîk eyînî pirtûkê da li ser pêwîstî, aktûêliya

bicîanîna lêkolînên zaniyarî yên dîrok û ola kurdên êzdî radiweste û wa dinivîse: “ Heger lêkolînên wisa hebûna (yên ku me hêja besa wan kir-W.E.), gel raştiya dîroka xwe bizanbûya, serwext bûya çima, çawa ew buyer pêk hatin (bûyarên birakujîyê navbera kurdên musulman û yên êzdî da- W. E.) dijwar êzdîkî helalî bi sidqê qenc hebûya, ku pey wê koma “êzdiyên” sexte û miletçiyên ermenî biçûna û qewimiyeta xwe, koka xwe, kurdîtiya xwe înkarkirina...” (rûp.7). Pêwîste em li vê tangê wê raştiyê kifş bikin, ku Eskerê Boyîk wek rewşenbîrekî kurdî welatperwer, miletparêz cêrgên ronakbirên kurd yên pêşin da dimeşîya, singe xwe kuta bû nîze, rimên xêrnexwez, nezan û menfetçiyên bona paraştina yekîtî û navê miletê kurd.

Vê tangê da usan jî balkêşin lêkolîn û gotarên wîye: „Êzdîtî bawariya heqiyê, rehmê û Xwedênasiyê ye“, lêkolînên wî li dor dîroka êlên Êzdiyên Serhedê: Êlên Hesinya, Sîpka, Zuquriya, “Şêx Fexrê Adiyân û edeba Êzdiyan ya sedsala 11-13 an”, “ Bexudana êlên Xalta”, “Êzdîtî gerekê bibe ware zaneştîyê”, analîza hinek qewlên êzdiyan û hvd...

Eskerê Boyîk hinek lêkolînên dine yên ser civaka kurdên êzdî û wisa jî romana xwe: “Xezeva Xwedê ” da ku bi dû cildan (2004 û 2008) hatîye weşandin, ser zor û zulma rêjîmên dagirkerên Kurdistanê, ci-hana misilmaniyê û navê da, sed mixabin, ya beşeke rêvabirên kurdên musulman himberî êzdiyan disekine. Eskerê Boyîk di vê pirsê da cuda dibe ji hinek nivîskaran, ew wê zor û zulmê bi çavên kurdîtiyê mêze dike û tiradêjiya kurdên êzdî wek ya temamîyê kurdan dihesibîne. Ewa helwesta here rast e, heger em wê yekî bigrin ber hesêb, ku ne ku kurdên misilman wek beşeke gelê kurd ya here mezin, here giran zor û zulm li êzdiyên hindikaya gel kirine, lê rêjîmên dewletên dagerkir, bi tebyetî ya Tirkiya Osmaniye û xulamokên wan kurdên misilman jî nav da hebûn bi şikilê axa û began.

Eskerê Boyîk devedevî 25 sala sêkrêtarê (katibê) sêksiya, beşa nivîskarên kurd bûye ya Yekîtiya nivîskarên Ermenîstanê. Wî weke çarêka sedsalekê dîroka kar û barên sêksîyona nivîskarên kurd di pirotokolên civînên nivîskarên kurd da tomar kirîye û hemûşkî bêtir axaftina nivîskaran ser wan berheman, kîjanan re bona weşendinê rêkomendasiya (kefildariya) seksîyonê pêwîst bû.. Bi tomarkirînê re bi tevayî ew bi aktîvî beşdarî analîzkirina berhemên ber cape bûye.

Ji despêka salên 80 î deşt bi weşendina almanax, berevoka (em di-karin wê weke antolojiya jî bi nav bikin) berhemên nivîskarên kurd bû li Yêrêvanê, ku sale carekê, despêkê da bi nave “Bahara teze”, pişt re “Bahar” dihat çapkirinê. Eskerê Boyîk yek ji amadekar rêdaktorê wê bû.

Eskerê Boyîk salên 90 î sê sala li paytextê Qazaxîstanê- Almaatayê ma, li ku gelek kurd diman ku salên 30 î û 40 î ji Azeyrbêcanê û Gurcîstanê sirgûnî Asiya Navîn kiribûn. Lê li vir jî Esker vala nesekinî, bi aktîvî tevî xebata komela wan yekîtiya Kurden Qazaxîstanê bû, beşdarî karê çandî û nemazê yê civakî bû, ber ku li wir hewcê zanînen yên weke wî bûn. Ew dibe endamê Yekîtiya nivîskarên Komara Qazaxîstanê, helbestên hîmdarê edebiyata Qazaxa- Abay ji rûsî werdigerîne kurdî, bi alîkariya Ezîzê Zîyo temamiya belgeyên KGB yên li ser sirgûniya kurdan ya 1937 û 1944 ê salê ji komarên Kavkaziya berbi Asiya navîn (cara ewil) ji arşîvên veşartî derdxe, hazir dike, kîjan ji bo nivîsandina pirtûka Ezîzê Zîyo “Kurdê Qazaxîstanê “ bû bingeş.

Ew tev Prof. Knyazê Îbrahîmî edebiyatzan dibe amadekarekî kovara bi nave “Kurd” ku paşê nave “Nûbar” danîn li ser wê. Bi rêdaktoriya Kinyazê Brahîm Mîrzoyêv û berpirsyarya Eskerê Boyîk, piştî weşena 6 hejmara ew Almatayê dihêle diçe Almaniyayê, bajarê Oldenbûrgê, li

ku komela Êzdiyan hebû: “Mala Êzdiyan “. Ew bi aktîvî di nava kar û bare wêda cî digre. Dibe endemê komîtêya wê ya rêvabir, serkariyê komîtêya wê ya rewşenbîrî dike.

Mala Êzdiyan ya bajarê Oldênbûrgê, ku niha bûye navendeke rewşenbîriyê, kurdzaniyê-êzdîzaniyê, keda Esker di wê yekê da pir e. Bi berpirsyarî, însatîv û tevbûna wî salê da bi dehan sênînar, konferans û çalakiyên civakî-zanyarî biçûk û mezin tene biçanînê, malpera wan ya “Dengê Êzdiyan” bûye malpereke kurda, bi taybetî ya Kurdên êzdî ya here eyan, weşena “Dengê Êzdiyan” bi deha pirtûk daye weşandin.

Eskerê Boyîk eyînî ronakbire. Nîşana wê yekê, ku li bal Esker zelal tê kifşê ez wê yekê dihesibînim, ku ew rûmeta pênûsa heval û hogiran zane û keda wan bi obyektîvî, gorî hêjabûnê dinirxîne. Di vî warî û, weke min tê derxistîye, hemû warên wîjdanî û îsanî da min li bal wî hogirê xwe misqaleke ernûsiyê, dexesyê, çevnebariyê tecrûbe ne kirîye. Belkî eva ji xeysetê wî yê ronakbîriyê ya bilind, ji zanînen wî yên kûr tê. Lê dîsa jî, weke min tercûbe kirîye, hinek ronakbîrên xudanê zanînen kûr, keda berhemdariyê ya mezin jî carna carnûsiyê û dexesiyê himberî hogirên xwe yên pênûsê da dîhar dîkin. Lê ev fêl ev xeyset bal Esker qet kifş nabe. Bi serda jî Esker hilbet, gorî hêjatiyê pesinê ronakbîrên weke xwe helbestvan jî dide û wî warî da pir merde, destvekirîye.

Haya hemû ronakbîrên kurd jê heye, ku Esker bi çî awayî merd-merdane pesinê poêziya Şikoyê Hesên û Fêrîkê Êsiv di pirtûka xwe ya “Nûra Elegezê” da daye, helbet, bi lêkolîn, analîzkirina berhemên wan. Di ware îsanetiya wî da min tiştekî dinê jî yê qenc tercûbe kirîye. Ew li hemû ronakbîrên, heger em dikarin wa jî bêjin, yên bi şûret yên welatîyên xwe, ji Ermenîstanê xweyî derkeve, gava pêwîstî di wî warî da çê dibe. Ew keda wan bi hêjatî radixe li ber çavan, îlahî wan yên ku

gorî wî bi zemanekî kifş û bi neheqtî bin siyê da mane. Dilê wî ji ber vê neraştîyê dêşe û ew li ronakbîrên jibîrkirî xwedî derdikeve. Ez êdî derheqa wê yekê da nabêjim, ku ew zemanên pêwîst da rojbûyîna wan bi nivîs, bi gotarên xwe yên hêja va kifş dike. Ev kirina wî jî hêjayî hemû cûrên pesindanane.

Eva xên ji heştên berpirsiyariyê ji dilovanî û dilsoziya wî tê. Û gava ronakbîrekî welatîyên wî dice ber rehma Xwedê Esker teva pirtir ber dikeve, ne baware ku ronakbîrekî angorî wî wê peyda bibe û ciyê wî tijeke, dilêşîya xwe bona çêbûna wê zîyanê û kêmasiyê îlan bike û keda wî li ber gel û çanda wî da bi hêjatî binirxîne.

Dawîyê ez weke hogîrekî Eskerê Boyîk yê nêzîk li ber hesabgirtina reng û rû, bejin û bal meşîyana wî û nemaze kar û bare wî yê berhemdayînê, lêkolînyariyê, ku ew îro 70 saliya xwe da jî bi cî tine, ku gorî felsefa gelê me dihesibe sîmbola kalbûnê, bi şabûn û hêviya temam dikarim bêjim, ku ewê hê sûrpirîzên nû raberî gelê xwe bike bi cîanîna nivîsandina berhemên edebyeta bedew û lêkolînên zanyariyê yên nû.

Eskerê Boyîk sala 1984 da endemê Yekîtiya Nivîskarên walatê sovêtê bû, endemê Yekîtiya nivîskarên Komarên Ermenîstanê û Qazaxîstanê, endemekî PEN a Kurd.

Bahoz“ û „Deftera kurdekî penabir salên 1999-2002 a jimarên rojnameên HÊVÎ, Roja Teze û Dema Nû da çap bûne, şanoya „Selîm Beg“ kovara „Nûbar“ da (sala 1995 a), lêkolîneke berfireh li ser helbestvaniya Cegerxwîn kovara DENG da sala 2003 a hatîye çapkirinê. Bi berpirsî û rêdaktoriya wî pirtûka Ezîzê Zîyo Aliyêv „Kurdên Qazaxîstanê sala 1995a li Almatayê hatîye weşandin. Pirtûk li ser dîrok û bûyarên kurdên Qazaxîstanê ku salên 1937 a û 1944 a ji komarên Kavkaziyaê sirgûnî wur kiribûn.

Eskerê Boyîk xudanê pir gotarên zanyariyê-pûblîsîstîye, rêsenziyayên ser nivîskar û zaniyara û bi tebyetî berhem û lêkolînên wane, her wisa jî pêşgotinên pirtûkên kurdîyê. Bi pêşgotinên wî hatine weşandinê: romana Heciyê Cindî „Hewarî“ (Weşena Roja Nu, 1999), bervoka novêl-serhatiyên Wezîrê Eşo „Pariyê Berdamayî“ (Hewlêr, 2008), pirtûka Ahmed Camîlibêl „Evdalê Zeynikê“ (Weşena Deng), berevoka „Zargotina Kurmanca“ ya Heciyê Cindî û Emînê Evdal (Weşena Avêsta, 2008), cilda sêyemîn ya berhemên rehmetiyê Fêrîkê Êsiv (Yêrêvan, 2009).

Hazir kirye û rêdaktorî çend berevokên efrandinên nivîskarên kurdên Ermenîstanê- BAHAR ê kirîye. Rêdaktorê romana Egîte Xudo “ Dê û Dêmarî” (Yêrêvan 1986), pirtûka Ahmedê Gogê “Dengê kal-bavê me” (Yêrêvan-1997) bûye, serokê rêdkolêgiya weşena berevoka “Şêx Fexirê Adiyân filozof û xasê ola Êzdiyatîyê” (Weşena Dengê Êzdiyan,2009).

Lê, awa, her bi tenê sernavê çend gotarên Eskerê Boyîk yên zanyariyê ye giranbiha, ku li ser rûpelên malper, rojname û kovarên kurdî hatine weşandinê: “Nêrîneke kurt li ser edebiyata kurdên Sovyêtê”(kovara Deng” 2000), „Fêrîkê Êsiv, jiyan û kar“.- Riya Teze (2009), „Şekroyê Xudo, jiyan û kar“.- Riya Teze (2010), „Êzdîtî baweriya heqiyê, rehmê û Xwedênasiyê ye“.- Peyama Kurd, jimarên 8-10 (2003), „Serhatiya Cangîr Axa“.- kovara Laliş Duhok (2004), „Êzdiyatî gerekê bibe warê zanyariyê“, „Ez çûme Hecê“.-Salnama Ehmedê Xanî, (Weşena Belge yayînlari, 2010) “ Şêx Fexrê Adiyân û edeba Êzdiyan ya sedsala 11-13 a“.- „Berevoka Şêx Fexirê Adiyân filosof û xasê ola Êzdiyatîye“ (Weşena Dengê Êzdiyan,2009), “ Berxudana êlên Xalta”.- Berevoka „Mêrxasên Êzdiyan“ bi zimanê Almanî. Salên 1990-1999 an Esker li ser rûpelên rojnema Riya Teze jî cêrga „Gundên kurdan li Ermenîstanê” derheqa payê gundayî pirê da oçêrkên balkêş dan weşandinê û gelek lêkolîn û gotarên din.

Berhem

- 1.ŞIVERÊ, helbest, Yêrêvan, 1966.
 - 2.KULÎLKÊN ÇÎYA, helbest, Yêrêvan, 1975.
 - 3.KULÎLKÊN ÇÎYA, helbest, bi zimanê tirkî,kurdî, Stembol,1979.
 4. SINCO KEÇA XWE DIDE MÊR, şano, Yêrêvan, 1980.
 - 5.MEM Î ZÎN, şano, Stokoholm, 1989.
 - 6.TÎRÊNC, (di berevoka BAHAR da), helbest, Yêrêvan, 1987.
 - 7.KULÎLKÊN ÇÎYA, helbest, bi zimanê tirkî,kurdî, Stokoholm, 1990.
 - 8.LI ÇÎYA, kurteçîrok, Yêrêvan, 1991.
 - 9.DUAYA SERÊ SIBÊ, helbest, Roja nû, 1997.
 - 10.ODA ÇÎROKAN 1, helbestên zarokan, Roja nû, 1997. 11.KULÎLKÊN BIRÎN-DAR, helbest, Stokoholm, 1998. 12.GOVENDA HERFAN, helbestên zarokan, Stokoholm 2002.
 13. Çîrokên oda me; kurteçîrok, weşenên Afîş Medîa, 2004
 14. Nûra Elegezê; edebyetzanî, Dengê Êzdiyan, Oldenburg, 2004
 15. Êzdiyatî, Mîrzikê Zaza, Fermanên reş, dîrok; Dengê Êzdiyan, oldênbûrg, 2006
 16. Xezeva Xwedê, roman, beşa ewlin, weşena Deng, Îstenbol, 2004.
 17. Xezev; roman; beşa dudan, weşena Deng, Îstenbol, 2008
 18. Ez kilameke melûlim, helbest, weşena Deng, 2009 19. Nûra Elegezê, bi tîpê erebî, Duhok 2011
 20. Bahoz, roman, weşena AVÊSTA, Îstenbol, 2011
- <http://berbang-nur.com/?p=7045>
 #EskerêBoyîk #helbestvan #nivîskar #KurdênSovyetê